K.T

ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

LI HERÊMA KERBORANÊ ÇANDA ZÊWÊ Û EFSANEYÊN KU LI SER ZÊWAN TÊN VEGOTIN: ZÊWA ŞÊX MOMINA Û ZÊWA ŞÊX MEHMÛR

Xwendekar

Mızgin ÇETİNKAYA

22721023

Şêwirmend

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

Mêrdîn 2023

K.T

ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

LI HERÊMA KERBORANÊ ÇANDA ZÊWÊ Û EFSANEYÊN KU LI SER ZÊWAN TÊN VEGOTIN: ZÊWA ŞÊX MOMINA Û ZÊWA ŞÊX MEHMÛR

Xwendekar

Mızgin ÇETİNKAYA

22721023

Şêwirmend

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

Mêrdîn 2023

T.C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

PROJE ONAYI

Enstitümüzün Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı 22721023 numaralı öğrencisi Mızgin ÇETİNKAYA'nın hazırladığı "**Li Herêma Kerboranê Çanda Zêwê û Efsaneyên Ku li Ser Tên Vegotin: Zêwa Şêx Momina û Zêwa Şêx Mehmûr**" başlıklı BİTİRME PROJESİ ile ilgili SAVUNMA SINAVI, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 07.09.2023 tarihinde saat 13:00'da yapılmış, tezin onayına OY BİRLİĞİYLE karar verilmiştir.

Danışman…….. (İmza)

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

Üye …….. (İmza)

Doç. Dr. Necat KESKİN

Üye …….. (İmza)

Dr. Hikmettin ATLI

...../...../2023

……..

Enstitü Müdürü

(Doç. Dr. Ahmet KIRKAN)

ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında;

 Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,

 Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,

 Tez çalışmasında kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,

 Tez çalışmasının özgün olduğunu,

 Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan "bilimsel intihal tespit programı" ile tarandığını ve hiçbir şekilde "intihal içermediğini" beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi bildiririm.

İmza

Mızgin ÇETİNKAYA

04.09.2023

KURTE

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

Li Herêma Kerboranê Çanda Zêwê û Efsaneyên Ku li Ser Tên Vegotin: Zêwa Şêx Momina û Zêwa Şêx Mehmûr

Mızgin ÇETİNKAYA

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zîmanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Hejmara Rûpelan: 29

Zêw, ji wan merasîman re tê gotin ku bi amanca bîranîna kesayetên dînî, salê carekê bi şêweya mihrîcana gel li ser gorên wan tên lidarxistin. Rîtûelên zêwêji bo xurtkirina hezkirinê ya di navbera însanan de û di parvekirina jiyaneke hevpar a civakî de roleke pir giring dilîzin. Ev kevneşopî bêhtir li herêma "Torê" berbelav e. Ev rîtûelên wek festîvalan heta salên 90î jî bi kêf û coş dihatin lidarxistin û pîrozkirin lê di roja me de ev çanda qedîm qels bûye û hêdî hêdî tê jibîrkirin. Lê hebûna efsaneyan sedema nejibîrkirina vê kevneşopîyê ye.

Li herêma Kerboranê ji bo wan kesên ku her sal zêwa wan tê lidarxistin gelek efsane tên gotin, ji ber vê jî Kerboran yek ji wan deveran e ku çanda zêwê her çiqasî hêza wê kêm bûbê jî hîn jî pir berbelav e. Ji ber vê yekê,em di vê xebatê de li ser zêwên li herêma Kerboranê sekinîn û heta ji destê me hat me ew efsaneyên ku tên vegotin berhev û deşîfre kirin.

Xebata me ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de, em li ser dîrok û taybetîyên herêma Kerboranê sekinîn ji ber ku sînorê xebata me herêma Kerboranê bû. Di beşa duyem de em li ser pênaseya têgihên efsane û zêwê sekinîn û heta ji destê me hat me pêwendîya di navbera wan de rave kir. Di beşa sêyem û dawî de jî me behsa Zêwa Şêx Momina û Zêwa Şêx Mehmûr kir û efsaneyên ku derbarê wan de tên vegotin nîşan dan. Dawîyê jî me xebata xwe bi encam û nîşandana çavkanîyan qedand. Di dawîya vê xebatê de em gîhaştin vê encamê; efsane pêşî li ser kesên pîroz hatine vegotin lê paşî bi belavbûna wan a di navbera gel de bûne sedema derketina çanda zêwan û bi berbelavbûna vê çandê re efsaneyên nû nizilîne û me dît ku carinan van efsaneyan forma xwe guhertine û bûne çîrok.

Bêjeyên Sereke: Zêw, Efsane, Kerboran, Dîn, Bawerî

ÖZET

Tezsiz Yüksek Lisans Bitirme Projesi

Kerboran Yöresinde Zaviye (Zêw) Kültürü ve Üzerine Anlatılan Efsaneler: Şeyh Momina ve Şeyh Mehmûr Zaviyeleri

Mızgin ÇETİNKAYA

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Sayfa Sayısı: 29

Zêw, dini şahsîyetlerin mezarlarında yılda bir kez festival şeklinde düzenlenen anma törenlerine verilen isimdir. Bu merasimler insanlar arasındakı sevgi ve saygı duygularını güçlendirmekte ve paylaşıma dayanan ortak bir yaşam oluşturmakta büyük bir role sahiptir. Bu gelenek çoğunlukla"Tor" bölgesinde yaygındır. Bu ritüeller 90'lı yıllara kadar festival havasında kutlanırdı fakat günümüzde unutulmaya yüz tutugunu görmekteyiz.

Her ne kadar eskisi gibi kutlanmasalar da Kerboran bölgesinde hala her sene bu etkinliğin yapıldıgını görmekteyiz. Şimdiye kadar zêwler üzerine neredeyse elle tutulur hiçbir çalışma yapılmamış bu yüzden de bu çalışmayı Kerboran bölgesinde halen kutlanan ve binlerce efsaneye sahiplik yapan bu konu üzerinde yapmaya karar verdim. Bu çalışma Kerboran bölgesinde kutlanan iki tane zêwden bahsetmeyî ve zêwleri kutlanan kişiler hakkında aktarılan efsanelerın derlenip deşifre edilmesini amaçlamaktadır.

Bu çalişma üç bölümden oluşmaktadır. Çalışmamızın birinci bölümünde Dargeçit (Kerboran) ilçesinin tarihi ve özellikleri bulunmaktadır. İkinci bölümde efsane ve zêw kavramlarının tanımı ve bu kavramlar üzerine olan açıklamalar yer almaktadır. Bu çalışmamın son ve üçüncü bölümü Dargeçitte (Kerboran) hala kutlanan iki tane zêw (Zêwa Şêx Momina ve Zêwa Şêx Mehmûr) ve adına zêw etkinliği düzenlenen kişiler için bölgede söylenen efsaneler yer almaktadır. Çalışmamız sonuç ve kaynakça ile sona ermektedir. Bu çalışmanın sonucunda şu kanıya vardık; ilk önce kutsal kişiler için söylenen efsaneler daha sonra zêw kültürünün oluşmasına vesile olmuştur, daha sonra bu kültürün halk arasında yaygınlaşması ile yeni efsaneler oluşmuş ve bu efsanelerden bazıları form değiştirerekhikayeye dönüşmüştür.

Anahtar Kelimeler: Zêw, Efsane, Dargeçit (Kerboran), Din, İnanç

ABSTRACT

Without Thesis High Licence Finish Project

Zawiya (Zêw) Culture in the Kerboran Region and the Legends Told About It: Sheikh Momina and Sheikh Mehmûr Zawiyas

Mızgin ÇETİNKAYA

Mardin Artuklu University

Institute of Living Languages in Turkiye

Kurdish Language and Culture Department

Number of Pages: 29

Zêw is the name given to the commemoration ceremonies held in the form of a festival once a year in the graves of religious figures. These ceremonies have a great role in strengthening the feelings of love and respect between people and in creating a common life based on sharing. This tradition is mostly common in the "Tor" region. These rituals were celebrated in a festive mood until the 90s, but today we see that they are fading into oblivion.

Although they are not celebrated as before, we still see this event being held every year in the Kerboran region. Almost no tangible work has been done on "Zêws" so far, so I decided to do this work on this subject, which is still celebrated in the Kerboran region and has thousands of legends. This study aims to talk about two zêws celebrated in the Kerboran region and to compile and decipher the legends about the people whose Zêws are celebrated.

This study consists of three parts. In the first part of our study, the history and features of Dargeçit (Kerboran) district are included. The second chapter includes the definition of the concepts of legend and Zêw and explanations on these concepts. In the last and third part of this work, there are two Zêws (Zêwa Şêx Momina and Zêwa Şêx Mehmûr) that are still celebrated in Dargeçitte (Kerboran) and the legends told in the region for the people whose zêw event is organized. Our study ends with conclusion and bibliography. Our study ends with conclusion and bibliography. As a result of this study, we came to the following conclusion; The legends first told for the holy people later became instrumental in the formation of the Zêw culture, then new legends were formed with the spread of this culture among the people and some of these legends changed form and turned into stories.

Keywords: Zêw, Legend, Dargeçit (Kerboran), Religion, Belief

PÊŞGOTIN

Destpêka mirovahîyê di eslê xwe de ew bêhizûrî ye ku ji wê teşqeleya rewşa nedîyarîyê nizilîye. Zayîn û mirin du têgihên binyatî yên jiyanê ne. Însanan ji bo armanca bersivandina pirsên li ser beriya zayîn û piştî mirinê bi milyonan xebat kirine û ev pirs bûne sedema derketina têgehên wek bawerî, dîn, huner, felsefe û hwd... Nedîyarî bi xwe re tirsekî, tirs jî pêdivîya xwespartina stargehekê derdixe meydanê. Bêgûman stargeha herî ewle ya ku însanan ji xwe re ava kiriye bawerî ye. Bawerî jî bûye sedema derketina dîn, felsefe, edebiyat û hunerê.

Bawerî û dîn xwedî bandoreke mezin in li ser hest, raman û tevgerên însanan. Ji ber vê rewşê jî em dibînin ku bawerî çawa dibe bingeha civak, adet, kevneşopî, çand û nirxên dînî yên jîyanê. Vê rewşê pêşî derî li ber vegotinên devkî vekiriye. Yek ji wan cureyên vegotinên devkî jî bêguman efsane ye. Efsane, hewildaneke bersivdayîna pirseke bêbersiv e, lê miheqeq bersivekêdi nava xwe de vedihewîne.

Dîn û bawerî hêza xwe ji mît û efsaneyan distînin, hêzeke ku tu carî di nava xwe de gumanê venahewîne. Di nava civaka kurdan de gelek efsane hene û di her kêlîyê de jî dibe ku efsaneyên nû vejîn. Di navbera efsane û dîn de peywendîyeke gelekî xurt heye. Efsane ji dîn, dîn jî ji efsaneyê hêza xwe digire û bandora xwe ya li ser civakê qewîntir dike.

Dema însan bêçare dimîne, dixwaze dengê xwe bigihîne Xwedê, li amûrekê an jî li cihekî digere ji bo ku têkilîyekê bi Xwedê re deyne. Ev amûr an jî cih, carinan peykerek, carinan mizgeftek an jî dêrek, carinan jî gorek e. Însan van deran zîyaret dikin û bi referansa wan hêvî dikin ku dengê xwe digihînin Xwedê. Ev hêvî hem baweriya wan xurtir dike hem jî ruhê wan sivik dike. Di nava civaka kurdan de jî temsîlîyeta herî baş a vê rewşê zîyareta gorekî ye. Ew bi hêvîya ku şifaya her derdê xwe bibînin xwe dispêrin gora kesên pîroz û efsûnî, ku di nava gel de wek şêx, mişayîx, pîr û qencê xwedê tên qebûlkirin û rêzgirtineke mezin li hember wan tê girtin. Gelek caran ji bo wan kesan qurban tên serjêkirin û gelek merasîmên curbicur tên kirin. Yek ji wan merasîman jî zêw e, ev rîtûel her sal ji bo bîranîna van kesên pîroz tên lidarxistin. Çanda zêwê pêywendîya di navbera dîn û civakê de gelekî baş temsîl dike. Di navbera zêw û efsaneyan de jî ragihandineke xurt heye ku efsane gelek caran dibin sedema pêdivîya pîrozkirina zêwan. Rîtûelên zêwê her çiqasî wek rîtûelên dînî xuya bikin jî ew çavkanîyine giring in ji bo geşedana folklorê. Bi qasî ku em dizanin xebatên ku li ser çanda zêwê û peywendiya di navbera wan û efsaneyan de hatine kirin, kêm in. Ji ber vê rewşê jî me xwest di vê projeyê de li ser rîtûela zêwan û efsaneyên ku derbarê wan kesên

pîroz de ku her sal zêw ji bo wan tên lidarxistin, tên vegotin lêkolînekê bikin û di dawîyê de jî encameke bi rêk û pêk bi dest bixin.

Di amadekirina vê projeyê de alîkarî û keda gelek kesan heye. Pêşî ji bo rêberî û sebra wî spasiya şêwirmendê xwe Doç. Dr. Kenan SUBAŞI û ji bo serrastkirina xebatê spasiya Dr. Sevda ORAK REŞİTOĞLU dikim û her wiha spasiya kesên ku bi sebir efsane ji bo min vegotin û malbat, heval û xizmên xwe dikim.

NAVEROK

KURTE ..... **III**

ÖZET ..... **IV**

ABSTRACT ..... **V**

PÊŞGOTIN ..... **VI**

NAVEROK ..... **VIII**

KURTEBÊJE ..... **X**

DESTPÊK **1**

Rê û Rêbazên Xebatê 1

Sînorên Xebatê 1

Armanc û Giringîya Xebatê 1

BEŞA YEKEM

DERHEQÊ KERBORANÊ DE HIN AGAHÎ **3**

1.1. Taybetîyên Navçeya Kerboranê 3

1.2. Dîroka Kerboranê 3

1.3. Taybetîyên Gundê Xelîla û Kerbenê 5

BEŞA DUYEM

PÊNASE Û TAYBETÎYÊN EFSANE Û ZÊWÊ **7**

2.1. Efsane û Taybetîyên Wê 7

2.2. Zêw û Taybetîyên Wê 9

2.3. Têkilîya di Navbera Rîtûela Zêwê û Efsaneyan de 10

2.4. Zêw li Herêma Kerboranê 12

BEŞA SÊYEM

ÇANDA ZÊWÊ Û EFSANEYÊN KU LI HERÊMA **15**

KERBORANÊ TÊN VEGOTIN **15**

3.1. Şêx Momina 15

3.1.1. Zêwa Şêx Momina 15

3.1.2. Kerametên Şêx Momina 16

3.1.3. Mezela li Kêleka Tirba Şêx Momina 16

3.1.4. Efsaneyên Derbarê Şêx Mominayê de Tên Vegotin 16

3.1.4.1. Efsaneya Derheqê Welîbûna Şêx Mominayê de 16
3.1.4.2. Efsaneya li ser Sofîyên Baxdayê û Bûka Şimayê 17
3.1.4.3. Efsaneya Tirî û Hejîran 18
3.1.4.4. Efsaneya Nifir û Duayên Wê ku li Heft Bavikan Kirine 18
3.2. Şêx Mehmûr 19
3.2.1. Zêwa Şêx Mehmûr 20
3.2.2. Kerametên Şêx Mehmûr 20
3.2.3. Efsaneyên Derbarê Şêx Mehmûr de Tên Vegotin 20
3.2.3.1. Efsaneya Hatina Wî ya Gund (Efsaneya Kêlikê Şêx Mehmûr) 20
3.2.3.2. Efsaneya Derheqê Zarokên Wî de 21
3.2.3.3. Efsaneya Çireya Şêx Mehmûr 21
3.2.3.4. Efsaneya Bayê Kurr 21
3.2.3.5. Efsaneya Hejîrê 21
3.2.3.6. Efsaneya Aşêva Birincê (Avîya Şêx Mehmûr) 21
3.2.3.7. Efsaneya Aşêfa Birincê ya Şêx Mehmûr-2 22
3.2.3.8. Efsaneya Rima Şêx Mehmûr 22
3.2.3.9. Efsaneya Tasika Şêx Mehmûr 23
3.2.3.10. Efsaneyên Dara Şêx Mehmûr 23

ENCAM 24

ÇAVKANÎ 26

KURTEBÊJE

Kr.	Kurdî
Bnr.	Binêre
Ç.	Çap
C.	Cild
Sd.	Sedsal
No.	Nimre
R.	Rûpel
Hj.	Hejmar
Hwd.	Her wekî din
Km.	Kîlometre

DESTPÊK

Rê û Rêbazên Xebatê

Ev xebata me ya bi navê "Li Herêma KerboranêÇanda Zêwê û Efsaneyên ku li Ser Zêwan Tên Vegotin: Zêwa Şêx Mominê û Zêwa Şêx Mehmûr", xebateke çawanîyê ye. Me di amedekarina xebatê de çavkanîyên nivîskî, dîtbarî û zarekî bi kar anîn. Me agahî ji pirtûk, hevdîtin, kovar, ferheng û hin malperên internetê wergirtin. Ji ber ku li ser vê mijarê çavkanîyên niviskî pir kêm bûn, me zêdetir ji çavkanîyên zarekî sûd wergirtin û em li ser wan rawestîyan. Mebi wan kesan re yên ku tevlî merasîmên zêwan bûne û şahidbûna pîrozbahîya wan kirine hevpeyvîn pêk anîn.Me hevpeyvînên xwe rû bi rû kirin û dengê vegêranan bi rêya telefonê tomar kir. Piştî karê berhevkarîyê qedîya, me ew agahî û efsaneyên ku vegêr vegotibûn deşîfre kirin. Nasnameya wan kesên ku me bi wan re hevpeyvîn pêk anîn di beşa çavkanîyan de hatin nîşandan.

Sînorên Xebatê

Çanda zêwê di erdnîgarîyeke pir fireh de berbelav e. Bi taybetî jî herêma Torê navenda vê çandê ye. Ji ber ku analîzkirina zêwan ya bi gelemperî mijara xebateke din e, di vê xebatê de em tenê li ser zêwên ku li Kerboran tên pîrozkirin sekinîn û me ji wan zêwan tenê du heb hilbijartin û em li ser wan hûr bûn. Sînorê xebata me navçeya Mêrdînê ya bi navê Kerboran e. Li Kerboranê 7 zêw tên pîrozkirin. Em ji wan zêwan tenê li ser Zêwa Şêx Mominê û Zêwa Şêx Mêhmûr xebitîn.

Armanc û Giringîya Xebatê

Zêw, çandeke kevnar e di nava civaka kurdan de. Ew di xurtkirina têkilîyên civakî û pêkhatina jiyaneke hevpar de xwedî bandoreke mezin in. Zêwan ji efsaneyan hêz girtine û heta roja me hebûna xwe domandine, efsane jî ji wan kesên ku her sal ev rîtûel ji bo wan tên çêkirin nizilîne. Amanca vê xebatê hem ravekirina têgihên zêw û efsaneyê hem têkiliya di navbera çanda zêwan û efsaneyan de hem jî berhevkirin û deşifrasyona van efsaneyan bû ku li ser vê mijarê tên vegotin. Ji bo em armanca xwe pêk bînin em li ser şopa hin pirsan meşîyan, ew pirs ev bûn: gelo zêw çandeke çawa ye, giringî û wateya zêwê ji bo kesên herêmê çi ye, di navbera zêwan û civakê de peywendiyeke çawa heye, efsane û zêw di nav têkilîyeke çawa de ne, gelo li ser Şêx Momina û Şêx Mehmûr ku her sal zêwa wan tê pîrozkirin kîjan efsane hatine vegotin û van efsaneyên ku tên vegotin bandoreke çawa li ser çanda zêwan kiriye? Bi vê amancê me du zêw hilbijartin û em li ser wan hûr bûn.

Zêw, carinan wek erkeke dînî carna jî wek erkeke folklorîk derdikeve pêşîya me. Her çiqasî armanca van merasîman dîn jî be di encama vê armancê de çandek û kevneşopîyek afirîye û her çûye bi alîkariya efsaneyan hîn berbelavtir û xurttir bûye. Giringiya vê xebatê jî ev e: Ev kevneşopîya ku bi sedsalan di nava kurdan de cih girtiye û bi xêra efsaneyên ku li ser wan tên vegotin hebûna xwe parastiye. Ev xebat ji bo ku vê çandê rave bike û efsaneyên eleqedar tomar bike hatiye kirin. Em di vê bawerîyê de ne ku ev xebat wê bibe çavkaniyek ji bo lêkolînerên vê qadê.

BEŞA YEKEM

DERHEQÊ KERBORANÊ DE HIN AGAHÎ

1.1. Taybetîyên Navçeya Kerboranê

Kerboran navçeyeke girêdayî bajarê Mêrdînê ye. Ev navçe dikeve nav sînorên Herêma Başûrê Rojhilatê Anadolûyê yê Tirkîyeyê û herêma Torê ya Bakurê Kurdistanê. Serjimara bajêr li gorî daneyên ku di 2010an de hatine nîşandan, tevî gundên wê 27.828 e. Dûrahîya wê ji Mêrdînê 110km ye. Navçeya herî nêzîk Midyat e, di navbera wan de 40km heye. Mezinbûna hektara wê nêzî 550 çarçik e. Bilindahîya wê nêzîkî 900 metreyî ye. Li rojhilatê Kerboranê, navçeya Şirnexê Basa (Güçlükonak), li rojavayê wê Midyat, li bakurê wê navçeya Batmanê Kercos û li başûrê wê jî Navçeya Şirnexê Hezex heye. Kerboran di navbera paralelên bakur yên 37-38an û merîdyenên rojava yên 41-42yan de ye.(Tc. Mardin Valiliği, 2023)

Cîyê ku Kerboran lê hatiye avakirin li (Herêma Başûrê Rojhilatê) Anadolû cîyê herî bilind û kaşî ye. Çiyayên wê yên pir bilind tune ne. Çiyayê wê yê herî bilind Çiyayê Sîtê ye. Berê daristanên ku ji dara Berûwan pêk dihatin ji ber texrîba însanan û sedemên wek şewatê pir qels bûne û îro em nikarin behsa daristanekê bikin. Îqlîma wê bejahî ye. Havînên wê germ û hişkayî ne û zivistanên wê jî sar û bi şilî ne. Ba bi gelemperî ji hêla rojhilat û başûrê rojhilatê tê. Însanên wir bi gelemperî debara xwe bi ajelvanî û cotkarîyê dikin.

Ji nava gundê Germavê ku 10-12 km ji navenda kerboran dûr e Çemê Dîcleyê derbas dibe. Ji nava gundên Germero û Derêca jî çemek derbas dibe. Ava vî çemî havînan kêm dibe û zivistanan jî zêde dibe. Gundî bi ava vî çemî avdanê dikin. Kanîya herî mezin a bajêr çavkaniya Serê Kanîyê ye. Li derdora bajêr gol tune ne. Ji ber ku av hindike li hin gundan ava bîran tê bikaranîn. Zemanê berê li Kerboranê gelek aş hebûn, ev aş ji aliyê Sûryanîyan ve hatine çêkirin, lê mixabin ji ber kêmbûna avê ev aş hemû hatine girtin û bûne kavil. Hê jî bermayîyên wan kavilan xuya dikin.(Tc. Mardin Valiliği, 2023)

1.2. Dîroka Kerboranê

Kerboran, navçeyeke girêdayî bajarê Mêrdînê ye ku li Başurê Rojhilatê Anadoluyê ye. Ji bo Kerboran di dîrokê de gelek nav hatine bikaranîn. Kher-Boran, Khar- Boran, Kerburan, Kerboran hinek ji van navan in.(Savcı, 2012: 13) Li gorî Altan Tan (2013: 118)Navê Kerboranê bi eslê xwe ji navê “Keferboran” tê ku ev nav jî navekî bi Suryanî ye.Peyva “kefer” tê wateya *gund,* peyva “boran” jî di wateya *derbasbûn*ê de ye ku tê wateya “derbaza

gund” yan jî “derbaseka gund” ku ev rastiyekê di nav xwe de dihewîne ji ber ku Kerboran zemanê berê li ser rêyên ticaretê bû gelek kes jê derbas dibûn, yanî mimkin e ku suryaniyan ji bo derbaza gund bi kar anîbin. Di roja me de bi kurdî navê wê Kerboran e, bi tirkî jî Dargeçit e. Wateya navê Kerboran, ker- dibore yan jî kêr-dibore ye, dema em li erdnîgariya Kerboranê binêrin em dê bibînin ku cîyê ew lê hatiye avakirin cîyekî li ser rêyên tîcaretê ye û gelek kerwan ji Kerboranê dibihûrîn, ji ber vê rewşê jî navê Kerboranê îhtîmaleke mezin ji peyva Ker-Boran tê. Berî mîlatê di navbera salên 500-1000an de herêm ji aliyê gelek qewman ve hatiye dagirkirin. Makedon, pers û rûmî ji herêmê derbas bûne. Avabûna Kerboranê wek herêmeke bi taybetî di serdema Selefkûsan de ye. Heta piştî Mîladê sedsala 5an li herêmê xirîstîyanî serdest e. Di sedsala 7an de artêşa Halît Îbn-î Welîd tê herêmê û vir dixe bin kontrola xwe. Wextê ku herêm dikeve bin hakimîyeta abbasîyan, tevgerên îmarê dest pê dikin û di serdema Harûn Reşîd de jî êdî Kerboran û gundên wê ava dibin.

Bi qasî ku tê zanîn dîroka Kerboranê dîrokeke kevnar e. Heger em bala xwe bidine ser Mezopotamyayê, yanî herêma ku di navbera Çemê Dîclê û Firatê de ye, ku wek cîyê destpêka dîroka mirovahî û medeniyatan tê qebûlkirin, em dê baş fêm bikin ku ew xwedî dîrokeke çiqasî kevnar e. Belgeyên herî kevin ên derheqê herêma Kerboranê de diçin heya dîroka Kralê Asûrî Abad Nîharîyê 1. û kurê wî Salmannasirê 1. Di serdema van her du hukimdaran de herêma Torê, suryanî dibêjin Tur Abîdîn yanî Çiyayê Pîroz, bi “Çiyaye Kaşarîn” tê binavkirin ku îro ev der wek herêma Mêrdîn û Kerboranê tê zanîn(Tc. Mardin Valiliği, 2023). Ji bo herêma ku Kerboran jî tê de ye Hêrêma Torê tê gotin. Sedema vê yekê jî ev e ku ew di sînorê Tur Abîdînê “Çîyayê Pîroz”de ye ku ev herêm ji bo suryanîyan devereke pîroz e. Ji xwe navê “Torê” jî ji pratîzebûna “Tur” yanî “Çîya”yê tê.

Kerboran bajarekî kozmopolîtîk bû, misliman, xirîstîtan (ortodoks, katolîk) û êzîdî hebûn, lê di roja me de tenê misliman mane. Kevintirîn nîştecîhên ku naskirî kurd û asûrî yanî suryanî bûn. Piştî mîladê di sedsala 4. de, di serdema Samanîyan de herêma Kerboranê bi dînê xiristiyanîyê dihese. Wê serdeme suryanî xirîstîyanîye qebûl dikin. Kurd di wê serdemê de zerdeştî bûn. Piştî ku ereb tên herêmê kurd Îslamê qebûl dikin û dibin misliman. Lê suryanî û êzîdî di salên 1915an de ji ber komkûjî û fermanên ku dewleta Osmanîyan li serê wan rakir mecbûr man cî û warên xwe terk bikin. Piştî çûyîna suryaniyan li Kerboranê tenê kurd dimînin. Îro gelek dêrên suryaniyan li navend û gundên Kerboranê hene lê ne aktîv in.

Li gorî rîvayetekê malbatên yekem ku hatine Kerboranê û li vir bi cî bûne malbatên Mardokî, Hanokî û Sûfîkî ne. Dîroka bicîbûna wan li Kerboranê ne diyar e, tenê baş tê zanîn ku ew malbatên suryanî ne.(Savcı, 2012: 17)

Li Kerboranê du eşîrên mezin hene. Yek ji wan Eşîra Erebyan e ya din jî Eşîra Basqil e. Eşîra Basqilîyan ji 16 gundan pêk tê. Gundên Eşîra Basqilîyan ev in:Batêr, Basqila Kavil, Berdahol, Botika, Qewaqa, Kûpras, Meranê, Şibêbîyê, Ezdêra, Şikeftika, Heştwan, Avadorê, Bosinca, Botijê, Sira û Banêhebanê ne. Eşîra Erebiyan jî ji 38 gundan pêk tê. Gundên Eşîra Erebîyan ev in: Şatira, Xelîla, Çêlik, Zengan, Emmara, Zivinga Çêlik, Germav, Îzar, Tîriwa, Lîyan, Şemsê, Gûhêrê, Gêrrê, Mihina, Miwêlê, Kerben, Başût, Bêrkevan, Erbayê, Deywan, Mişтê, Zêwikê, Derêca, Germero û hwd. (Tan, 2013: 112) Ev eşîr tev kurmanc in û bi kurmancî dipeyivin. Ji ber vê yekê jî em bi rehetî dikarin bibêjin ku li herêma Kerboranê herî zêde kurmancî tê axaftin.

Kerboran di 30ê meha Kanûna Pêşîn ya sala 1985an de statûya şarêdarîyê stand û di sala 1987an de ji navçeya Midyadê veqetiya û bû navçeyeke serbixwe.(Mardin Valiliği, 2023)

1.3. Taybetîyên Gundê Xelîla û Kerbenê

Gundê Xelîla (Kılavuz) girêdayî navçeya Kerboranê ye. Li Başûrê Rojavaya Kerboranê dimîne û 8 km ji Kerboranê dûr e. Sînorên gund heya rojhilatê navçeya Basayê ya bajarê Şirnexê didome. Li rojhihatê Xelîla gundê Werzikê,li Başûrê gund jî gundê Basqilê heye. Gundî debara xwe bi ajeldarî û cotkarîyêdikin. Xelîla yek ji wan gundên girêdayî Eşîra Erabîyan e. (Kılavuz Köyü, 2014)

Li gorî riwayetekê Kerboran berê dibin kontrola Mîrê Erbayê de bû û li Kerboranê ji Mîrê Erbayê mezintir tenê Yekanê Axa hebû. Şivanekî Yekanê Axayî yê bi navê Ereb hebû. Ereb bi eslê xwe ji Eşîra Milan bû lê ji ber ku xalê xwe kuştiye ji wir veqetiyaye û hatiye Kerboranê bûye şivanê Yekanê Axa. Yekanê Axa wî û keça xwe Gulê dizewicîne û heft kurên wî çêdibin. Mîrê Erbayê yekî zordest bû û her sal bi zorê ji her malbatê bi keçikekî re dizewicî, dema dor tê ser Malbata Ereb, wî ev zordarî qebûl nekiriye û bi kurên xwe re biryara kuştina mîrê Erbayê distîne û planekê çêdikin. Kurê wî yê piçûk Miço kincên jinan li xwe dike û diçe mala mîrê Erbayê û wî dikuje. Bi vî awayî hukma Eşîreta Erbayê li ser herêmê namîne. Piştî vê bûyerê heft kurên Ereb ji xwe re cihekî dibînin û gundekî ji xwe re ava dikin. Bi vî awayî ew dibine bavikê gelek gundan. Kurê wî yê bi navê Xelîl jî tê Xelîla û li wir gund ava dike. Ji ber vê rewşê jî navê gund ji navê Xelîl tê. Bavikê ku aniha li gund hene ev in: Budaxkî, Sînkî, Aydokî, Şelilkî, Aslankî, Hurikî û Reşkî. Li gor efsaneyê ji ber ku Şêx Mominê nifiran li van bavikan dike ev nav li wan tên kirin. Gora Şêx Momina li vî gundî ye û her sal zêwa wê tê pîrozkirin.

Gundê Kerbenê (Suçatı) girêdayî navçeya Kerboranêye. Gund li hêla Bakurê Rojhilata Kerboranê ye. Di quntara Çîyayê Sîtê de ye û 10 kmyan ji Kerboranê dûr e. Ev gund gundekî avî ye. Ji ber ku ava gund pir bû zemanê berê birinc diçandin û birinca wan gelekî bi nav û deng bû. Lê aniha ava gund kêm bûye û ne wek berê ye. Gundî debara xwe bi ajalvanî û cotkarîyê dikin. Gora Şêx Mehmûr li vî gundî ye û her sal zêwa wî li vir tê pîrozkirin.

BEŞA DUYEM

PÊNASE Û TAYBETÎYÊN EFSANE Û ZÊWÊ

2.1. Efsane û Taybetîyên Wê

Ji zayînê heta mirinê, tişta herî taybet ku însanan bi jiyanê ve girê dide û têkilîyên wan bi cîhanê re xurt dike çi ye? Pêwîstiyên bîyolojîk in, hest in, xeyal in, pirs in, çi ye tişta herî giring? Meraq e, ew meraqa ku destpêka lêgerîna bersivekê yan jî bersivan e. Ev hezar sal in belkî jî ji zayînê ve ye, însanan bi gelek cureyên vegotinên devkî van bersivên xwe xemilandine. Tiştên ku herî zêde di ruhê însanî de dibe sedema dilnerehetbûnekê, nediyarî ne, ew nediyarîyên ku însan nikare wan bibersivîne. Ji ber vê pêwistiya xwe jî ji bo nediyariyên ku nikarin bi zanistê bibersivînin, bersivên cur bi cur yên devkî ava kirine. Evrewş jî dibe çavkaniya herî giring ya cureyên vegotinên devkî yên gelêrî. Yek ji van curêyên ku rengê xweza û jiyanê di nav xwe de dihewîne jî efsane ye. Ji pirseke bêdawî re her tim bersiveke bêdawî pêwîst e,bêdawîbûn jî di efsaneyan de veşartî ye.

Efsane, çîrok û vegotinên xeyalî yên derbarê heyder û bûyerên derasayî de ne ku ji hezar salan û vir de digindirin, diguherin, kêm an zêde dibin, lê hebûna xwe her didomînin. (Çifçi, 2021) Li gor fikrên hevpar ên zanistên gelêrî, efsane, vegotin an jî çîrokên ku di dîrokeke dûr de hatineafirandin an jî ew rûdan in ku li gorî hunerê hatine formûlekirin. Esasen ne rast in lê vegêran û guhdarvan wan wek rastîyekê, rastîyeke ku jê guman nabe, qebûl dikin û jê bawer dikin. Ji aliyê civakeke piçûk bi rêya vegotina devkî û rûbirû derbasî civakên din dibe.(Degh, 2010)

Efsane, bêjeyeke hevpar a zimanên îranîye ku bingeha xwe ji peyva “afsane”yê digire û ew jî bingeha xwe “apasanha”ya zimanê avestayî digire ku wateya wê behskirina tiştekî ye. Her wiha di nav peyvê de wateyên efsûn û sihrê jî hene.(Nisaniyan Sözlük, 2023). Derheqê efsaneyê de gelek pênase hene.Yek ji wan pênaseyan -ku ya herî berbelav e- pênaseya Birayên Grimm e ku di roja me de jî bingeha gelek xebatên folklorîk e. Li gorî Birayên Grimm pênaseya efsaneyê wisa ye: Efsane, hîkayeyeke ku derbarê cih, rûdan, şexsekî rastî an xeyalî tê gotin.(Sakaoğlu, 1980: 4) Çend taybetîyên hevpar di van gotinan de derdikevin meydanê; efsane li gorî vegêranan di wextekî dîrokî de derketiye. Ew an bi rûdaneke dîrokî ve hatiye girêdan, an bi şexsekî xeyalî yan jî bi rastîyê ve hatiye girêdan. Efsane li gorî vebêjer li cihekî rast derketiye yanî di mekaneke dinyayî de derbas dibe. Efsane, her çiqasî hêmayên derasayî di nava xwe de dihewîne jî li gorî vegêran hîkayeyeke rast e(Sakaoğlu, 1980: 4) ku guhdar jî ji vê yekê tu caran gumanê nake. Li gorî Max Luthî, efsaneya esas behsa wan tişt an

jî rûdanên ecêb dike, yên ku însanî bêhizur dikin. Yanî ew jî balê dikişîne ser rastiya wan û di heman demê de derasayîbûna wan. Şikilekî efsaneyan yê diyar tune ye, carinan kin in carinan dirêj, carinan jî tenê hevokek in. Efsane cureyekî herî berbelav ê vegotinên devkî ye û bi hezaran efsane hene. (Bascom, 2003: 469)Li gorî William R. Bascom (2003: 469) di hin efsaneyan de dawî tune ye, Cihûyê Gerok hîn jî digere, hollandiyê ku difire hîn jî li nav behran digere û mala bi perî hîn jî bi le'net e. Li gorî Petikaınen (2003: 223)efsane parçeyeke jiyanê ye. Bersiveke alternatîfa pirsan e.

Wek cureyên din ên edebiyata gelêrî û vegotinên gelêrî, di efsaneyên gelan de hin motîf û mijarên hevpar tên dîtin. Ji ber vê yekê jî derbarê derketin û belavbûna wan hinek nêrîn derdikevin meydanê kudi heman demê de ji bo cureyên din jî derbasdar in.(Keskin, 2019: 171)Yek ji van nêrînan jî ya R. Rosiére ye kuderbarê belavbûna efsaneyan de behsa sê qaîdeyan dike. Ew qaîde ev in: Qaîdeya derbarê kokê de, li gorî vê qaîdeyê ji ber ku însan hemû xwedî heman qabiliyeta afirandinê ne û efsaneyên wan jî dişibin hev. Qaîdeya cihguhertinê; li gor vê qaîdeyê dema ku bibîranîna lehengekî zeîf bû, efsaneya ku derbarê wî de hatiye afirandin jî dev jê berdide û xwe li yekî navdar digire. Qaîdeya dawîyê jî qaîdeya adaptasyonê ye; li gorî vê qaîdeyê jî her efsaneya ku cih diguherîne xwe li gorî şertên civakî û etnografîk ên devera nû adapte dike.(Sakaoğlu, 1980: 7)

Ji ber ku çanda devkî ya mirovayetîyê di nav salan de diguhere û li gor şert û mercên mirovayetîyê gelek cureyên vegotinên gelerî derketine. Di navbera wan de girêdanek û têkilîyek heye. Mît, çîrok, destan, çîrokên gelêrî û efsane di navbera xwe de gelek hêma û motîfên hevpar vedihewînin lê her çiqasî di navbera wan de hevparbûn hebe jî cudahîyen berbiçav jî hene.Mît, efsane û çîrok ji hêla cî, wext, leheng û ya herî giring jî ji hêla bawerî û tevgerê ve ji hev vediqetin. Îhtimaleke mezin heye ku carinan çîrok veguhêze efsane yan jî mîtan carinan heman cureya vegotinê, li hin civakan wek efsaneyê li hinekan wekî jî mît tê qebûlkirin.(Bascom, 2003: 479). Mît û efsane du cureyên ku gelekî dişibine hev in. Hevparbûna wan jî ev e ku her du jî ji hêla vegêr ve wek rast tên qebûlkirin û baweriya xwe bi wan tînin. Li gorî ferhengeke folklorê ya navdar, efsane wekî kuhatibin jîyîn tên vegotin û gelek caran vebêjer dema behsa efsaneyê dike dibêje, "min bi çavê xwe dît", "hate serê filankes" an jî "hate serê min bixwe". Lê di mîtan de vebêjer rasteqîniya mîtêdispêre baweriya guhdarvanan. Dema ku rûdana mîtê pêk tê demeke gelekî kevn e, lê di efsaneyê de demeke dûr an nêzîk heye gelek caran jî roja me ye lê di mîtan de rewşeke wisa tune ye. Di mîtan de mekanê bûyerê dinyayeke din e, lê di efsaneyê de rûdan li ve dinyayê pêk tê. Di her duyan de jî pîrozbûn heye lê pîrozbûna ku mît rave dike pîrozbûneke Xwedayî an jî nîvxwedayî ye, ya

ku efsane behs dike pîrozbûneke însanî ye, lehengekî dîrokî yan jî kesayetekî olî ye lê miheqeq însan e.(Sakaoğlu, 1980: 21)Frazer, mîtan wek zanista sexte, efsaneyan jî wek dîroka sexte dibîne û wan bi wî şiklî analîz dike. Lê rastiyeke wiha jî heye ku însan her dem li gor tişta ku baweriya wan jê heye tevdigerin. Rûdanên di navbera efsane û destanan de wekî ku bi rastî jî hatine jîyîn tên qebûlkirin. Em dikarin destanan di rûpelên pirtûkên dîrokê de bibînin lê ji bo efsaneyan em nikarin heman tiştî bibêjin. Zemanê wan ji hev cuda ye, îro jî efsaneyek dibe ku biafire lê ji bo destanek bibe destan herî kêm pêncî sal lazim in, yanî lazime di navbera bûyera ku hatiye jiyîn û teşekkula destanan de wextek derbas bibe. (Sakaoğlu, 1980: 22) Em dikarin gelek efsaneyên ku dişibine hev li nav civakên cuda de bibînin lê destan netewî ne. Di destanan de pîrozbûnek tune ye. Pêkhatina cihê rûdan an jî bûyerê, hevparîya herî berbiçav a destan û efsaneyan e. Her du jî li vê dinyaye diqewimin. Motîfên derasayî di her duyan de jî hene lê lehengên sereke tim însan in. Li gel bêzemanî û bêmekaniya çîrokan efsane di duh, îro û sibê de ne û di her qada jiyana me de ne.

2.2. Zêw û Taybetîyên Wê

Zêw, ew merasîm û rîtûel in ku ji bo bîranîna kesayetekî dînî, her sal li ser gora wî tên kirin. Ev kevneşopîyeke qedîm a kurdan e. Îro em bi rehetî dikarin bibêjin ku li her bajarê Kurdistanê teqez gora kesayetekî dînî ku wek şêx, mişayîx, welî, seyîd tên binavkirin hene û wek qencên Xwedê tên qebûlkirin û her car ne bi awayekî birêkûpêk jî be qurbanek tê serjêkirin an jî şîvek ji bo wan tê dayîn. Lê li herêma Torê bi taybetî jî li bajarên Kerboran, Hezex û Kercosê ev zîyareta li ser gorên kesayetên dînî di nav gel de bûye rîtûeleke ku her sal di ‘eynî rojê de bi sedan însan diçin ser wê gorê û zêwa wî/ê kesî an jî kesê pîroz dikin.

Têgeha zêwê ji alîyê ferhengî ve tam nayê zanînji ku derê hatîye. Lê wisa xuya dike eslê peyva zêwêpeyva ji zawîyeyê ye. Zawîye di devê xelkê de sivik bûye û şeklê zêwê wergirtîye. Bi rastî jî her du peyv ji alîyê fonetîkê ve pir nêzî hev in. Ji ber ku merasîmên zêwan li ser gora kesayetekî dînî yê pîroz tên lidarxistin û di zawîyeyan de jî gora kesayetên dînî cih digirin, tê fêmkirin ku peyva zêwê ji zawîyeyê tê. Peyva zawîyeyê di eslê xwe de peyveke erebî ye û ji koka “zwy” tê û wek “**زاوية**” “Zâwîyat” ê tê û di wateya *goşe*, *qozî* de tê bikaranîn. Di tirkî de jî ev peyv di wateyên*goşe*, *qozî*de an jî qoziyên ku îbadet lê tê kirin hatiye bikaranîn. Peyva zawîyeyê di dîrokê de cara yekemîn di sala 1680yî de, di berhema Meninskî, Thesaurus de hatiye bikaranîn.(Türkçe ne demek, 2023)

Di navbera têgehên zêw û zawîyeyan de peywendiyeke pir xurt heye. Ji ber vê yekê jî pêwîstî pê heye ku em li ser dîroka zawîyeyê bisekinin. Îslam Ansîklopedîsî zawîyeyê wiha

pênase dike: “Zawîye, ew mekan e ku di bin çavdêrîya şêxekî de perwerdehîya tesewifê lê tê dayîn.” (İslam Ansiklopedisi, 2023)Zawîye di eslê xwe de wekî tekke jî tê qebûlkirin û bi gelemperî wekî tekke û zawîye bi hev re tên binavkirin. Tekke, ji wan avahîyan re tê gotin ku terîqet çalakîyên xwe lê dikin. Tekke bi gelemperî wek sazîyên îlmê bi têgehên terîqet û tesewifê hatine bibîranîn. Temsîla tesewifê di tekke û zawîyeyan de teqabûlî salên 750-800î dike.(Çelik, 2005: 17) Ji bo tekkeyan navên wekî “rîbat, zavîye, hankah, asîtane” jî hatine bikaranîn. Tekke ew sazîyên ku bêhtir li bajaran bûn, lê zawîye wek tekkeyên piçûk dihatin bikaranîn û bi piranî li cîyên piçûk, li ser rêyên kerwanan li gundên dûrî bajêr dihatin avakirin.(Çelik, 2005: 18)

Car carinan em dibînin ku tekke û zawîye wek navendên nexweşiyên derûnî û fizîkî hatine bikaranîn.(Kara, 1990: 179) Li herêma Kerboranê jî em dibînin ku hêvîya însanên herêmê heye ji şêx û mişayîxan ji bo dîtina dermanê derdê xwe. Mînak; Sêblal yê dîna ye, Şêx Hesen yê çavan û çîkê ye, Şêx Şa’ban yê zarokan e û hwd. û bi hezaran însan ji bo hêvîya şifabexşîyê xwe diavêjin hicrika wan kesan û diayan dikin.

2.3. Têkilîya di Navbera Rîtûela Zêwê û Efsaneyan de

Însan bi alîkarîya bawerîyê xwedî li jiyanê derdikeve û hebûna xwe li gor normên bawerîya xwe watedar dike. Cureyên gelêrî yên devkî jî çavkaniya xwe ji vê baweriyê distînin. Lê heger mijar însan û baweriyek be bêguman cureya ku herî nêzî wan efsane ye. Efsane, wek pîrozkirineke baweriyekê ye. Erê, efsane ji tiştên li dora kes an jî rûdaneke dîrokî pêk tên, di derbarê wan de bawerîyek heye lê ev bawerî di efsaneyên olî de pirtir e û xurttir e.(Keskin, 2019:169)

Di navbera rîtûela zêw û efsaneyan de têkiliyeke pir xurt heye. Li gorî ferhenga folklorê efsane bi vî şikilî hatiye nîşandan; bi piranî ew tişt (hîkaye) in ku derbarê ezîz û şahidan de têne vegotin di merasîm û xwarinên dînî de. Zêw jî jixwe di eslê xwe de merasîmên olî ne û çavkanîya ku bi sedsalan ew xurt kirine û heta roja me anîne li gorî me efsane ne. Keramet û sirên wan kesên ku di nava gel de wekî ewlîya, mişayîx, qencên Xwedê, şêx û seyîd tên qebûlkirin û ji bo însanan xwedî keramet in, çare û dermanên her tiştî ne ku pêşî emnîyêta xwe bi Xweda paşê jî ji van kesan tînin û rêzgirtineke mezin didin wan. Bi xêra efsaneyan nifş bi nifş vediguhêzin û bi alîkariya efsaneyan bawerîya li hember wan kesan xurttir dibe. Heger qelsî di baweriya kesekî/ê de hebe û ew bêbewerî ji bo keramet û sirrên mişayîx an jî şêxekî bin, em dibînin ji bo ku bi wê bêbaweriyê efsaneyek tê pêşberî me û ji aliyê vegêr bi armanca kesê bêbawer bike xwedî bawerî li hemberî şêx, mişayîx an jî welîyekî efsane tên bikaranîn. Wekî mînak:

"Wê salê ez û Yûnis ew, em çûne Kercosê, me go wella emê çin serekî li belediye beşqanî din. Kêlîkî çûne balê, îda sê çar zilame li balê bûn.Go ev xalê me seyyîd ji Batêrgizin (gundekî), yekî ji wanekê go; li Batêrgiz mala filankes li gund e? Me got; Na, wella çûwe rehmetê û zarokên wî li Batmanê ne.Go, ez hatime wê de hatime ber pîyê Şê Hesen, go çavê min spîk li ser bû, go, ez jî çûme li meqberê razeham, go heme kevokekî hat û xwe li nav çavê min da ku ez vecinîqîm, ma'lûm mi xwe ji ber da alîkî û mi çavê xwe vekir tiştek nebû, go min destê xwe da ber çavê xwe yî spîk li ser êdî timam bû, mi da ser wî ê spîl ne li ser ew jî timam bû. Go min go wella tiştekî min nema. Wêca bi sedan wilo ê ev tişt dîtin têne ber pîyê wî dibînin"[1] (Hacî Şukru Sancar)

Me li jor dema behsa efsaneyan kir me got taybetîyeke efsaneyan a giring ev e ku di vegotina wan de hesta "tirsê" pir berbiçav e. Ew mekanê ewlîya an jî şêxên ku gora wan tê de ye cîyekî pîroz e û em nikarin pelekî jî ji wan jê bikin yan jî pezekî bera nav wî mekanî bidin, miheqeq tiştek tê serê wî, wê kesê an jî wî pezî. Ji bo tirsa li hemberî goran efsaneyek;

"Rehmetiyê bavê min go rojekî ezî li ber karikan bûm, li wê deka ser e, go yekî li hespekî siwar bû û hat û di navê re hat û min dî bi hewa ket û çû ber serê neqepke û go min dî kir hawar, go min mêyizand ga ew hesp heme wî, Xwedê wekîle hîç gelfî tê de nîne, go wî hespî go heme wî li hev qulibe û ew heywan halo dirabe qûrrêniya wî û wilo ser serê xwe ve diqûlibe û xwe diberdê lo bi wî kaşî de. Go hat, go birazî ev çi eceb bi min de hat? Go me got: Amo, wella ev mişayîxê me dixeyidê, qey tu bi siwarî di nav de hatî? Go digo a wella min nizanîbû. Wilo heqqet jî heta wilo bêje heta pazdih salan wa jî bû go em bi heywanan diçûn me ne wêrabû, em peya dibûni li viyalî girîşka wî ya fetvayê hebû, em li wê derê peya dibûn hetta em derbas nebûbane em peya bûn. Her kes wilo bû yanî. Digotin siwaran qebûl nake. Îde go werhasil camêr go firaxkê wî ketibûn li wa dera, me arî me dane hevdû. Go min got wella amo heme tiştekî, sedeqekkî li xwe bêje wella wilo ye. Îcar nizanim bê camêr çi got, gotiye hespê wî sekinî. Go wella Sedaq! Û me firaxên wî dan hev û em çûn.[2] (Tewfîq Aslan)

Taybetîyeke din a efsaneyan ev e ku bi demê re dibe ku forma xwe biguherînin û bikevin kirasê çîrokê. Her çiqasî vegêrana wan veguhere çîrokê jî dîsa jî di nava xwe de wan motîfên efsaneyî wenda nakin. Efsaneya Şêx Momina mînakek e ji bo vê rewşê. Efsaneyên ku derheqê Şêx Momina de tên vegotin gelek caran em lê rast hatin ku bi formateke çîrokî tên vegotin. Li Kurdistanê bi hezaran efsaneyên mehelî hene û bi xêra wan, ji tirsan însan qet nikarin zerar an jî zîyanekî di nava sînorên wê goristanê de bikin. Efsane bi rastî jî wekî parêstgeha rîtûela zêwan e. Bi xêra efsaneyan têkilîyek di navbera însan û wan kesên oldar de çêbûye û ew rewş jî bûye sedema çêkirina rîtûela zêwan. Yanî em bi rehetî dikarin bibêjin ku efsane esas wek afirînerên zêwan in û heta ew bên gotin ev rîtûel jî wê nifş bi nifş veguhêze.

[1] Ev efsane derbarê Şêx Hesen de ye ku her sal bi hesabê Kurdî di 15ê meha têbaxê de îcar li gor hesabe roja pêncşem û înê zêwa wî tê pîrozkiri . Kerameta wî şîfabexşîniya çîk û çavan e. Ev efsanê ji aliyê Haci Şükrü Sancar (70) ve di 26ê Adarê de, di saet 11.52yan de hatiye vegotin.

[2] Ev efsane li ser Mişayîxekî navdar ê herêma Kerboranê, ku navê wî Şêx Ahmed e û ew birayê Şêx Bilal e hatiye vegotin. Efsanê ji aliyê Tewfîk Aslan (46) ve 26ê Adara 2023an de di saet 13.33yan de hat vegotin.

2.4. Zêw li Herêma Kerboranê

Çanda zêwê li Kerboranê pir berbelav e. Kevneşopîyeke qedîm e û her çiqasî ev kevneşopî di roja me de qels bûbe jî hîn jî her sal zêw tên pîrozkirin. Ev kesên ku zêwa wan tê pîrozkirin di rêya îslamê de xizmet kirine û gelek ji wan jî di dema şerê îslamê de şehît ketine. Li Kerboranê ne bi giştî jî be, ew kesên ku ji wan re şêx, mişayîx, pîr tên gotin, qencên Xwedê ne û li ser riya Xwedê, di şerê fileh û mislimanan de li ser rêya Heq şehît ketine. Keramet û sirên wan bêdawî ne û ji ber wê yekê jî ew pîroz hatine dîtin û ew kesayetên olî û mîstîk wek pêşengekî, rêberekî hatine qebûlkirin û ji bo her derd, daxwaz, hêvî, gazinan, xwe avêtine ber perdeya wan û piştî ku ew kes mirine gorên wan wek parêzgeheke pîroz gelek kes vehewandine û ji ber vê yekê jî di nava gel de li hemberî van kesên pîroz rêzgirtin û hûrmeteke pir mezin heye.

Kerboran bajarekî kevnar e û xwedî dîrokeke qedîm e. Ew dîroka qedîm bûye sedema veguhestina çandeke dewlemend jî. Bi taybetî jî bi muzîk û festîvalên xwe jiyaneke rengîn di nava xwe de vedihewîne. Festîvalên ku em ji wan re dibêjin zêw, bingeha xwe ji dîn distînin. Ji hêlekê ve hestên dînî yên mirovên herêmê dewlemend dikin û ji hêleke din ve jî çanda vegotinên devkî yên wek çîrok û efsaneyan ji nifşekê vediguhêze nifşeke din. Her çiqasî zêw di binyata xwe de merasîmên dînî jî bin ew bûne çavkaniyeke gewre ya edebîyata gelêrî jî, ji ber ku her çiqasî tê de erkên dînî hebin jî di wan rojên ku zêw dihat lidarxistin de muzîk, govend û seyran hebûn û bi coşeke mezin dihatine pîrozkirin. Di van çaxan de gelek çîrok û efsaneyên derbarê wan kesên pîroz de dihatin vegotin û însanan bi baldarî li wan çîrok û efsaneyan guhdar dikirin, bi vî awayî hem dilê xwe hem ruhê xwe têr dikirin. Ji ber van taybetmendiyên xwe jî çanda zêwê êdî dibe çavkanîyeke qerase ji bo edebiyata devkî.

Li Kerboranê her sal zêw li gorî hesabê kurmancî 15ê tebaxê yanî li gorî teqwîma mîladî di serê îlonê de dest pê dikin û sê hefteyan û ser hev, her roja înê bi beşdarbûna gelek însanan ku carinan hejmara wan digihişt hezaran, zêw dihat lidarxistin. Bi gelemperî li ser turbeyan lê carinan jî li hin mekanên li derdora gundê ku zêw lê ye, ziyafetên mezin dihatin dayîn. Zêw bi muzîk bûn. Bi gelemperî bi kemançê û kêm carinan jî bi def û daholê muzîka xwe çêdikirin. Însanên herêmê berî roja zêwê bi du mehan dest bi amadekarîya xwe dikirin, kincê nû ji xwe û zarokên xwe re distandin, qurbanên ku wê şerjê bikin amade dikirin. Ji bo civakê kelecanîyeke pir mezin bû. Du roj berî zêw dest pê bike însanan xwe amade dikirin û bi ker an jî hespên xwe diketin rê ji bo xwe bigihînin wî gundê ku zêw li wir e. Roja pêncşemê xwe digihandin cihê ku zêw lê tê pîrozkirin. Wê êvarê li wir diman û ew êvar bi

muzîk, govend û civatê diborandin. Jin û mêr diketin destên hev û stranên xwe wan bi xwe digotin û li hev vedigerandin. Derbarê çûyîna zêwê de hin agahî ji devê kesên ku çûne zêwan:

> "Roja zêwa Kerben hemmmî kes diçû zêwê, di tebaxê de em diçûn. Zêwa Sêblal ya paşîyê bû, em diçûne ya Xelîla, em diçûne ya Kerben, em diçûne ya Derêca, em diçûne ya Şêx Hesen û ya paşîyê ya Sêblal bû. Wextê em diçûne zêwa Sêblal wilo eme li wa dera bûn. Her kes direqisîn mitirp dihatin milet direqisî û îdî gundîyan xwarin didan wan. Belkî deh nefse li malekî bûn. Ya Kerbenîya exlebe mehîr didane ma (dikenê). Ez çûme ya Xelîla jî ya Kerben jî ya Derêca jî ya Şêx Hesen jî û ya Sêblal jî. Em piçûk û zewîcî jî bûn em dişyandin. Carekî min çû kirasekî xwe yî pembe ji bo pê biçim zêwê min ji xwe re dirût. Min kirasê xwe yî pembe li xwe kir û ez çûme zêwa Sêblal. Em berî roja zêwê 'esran diçûn siba em dihatin. Em bi pîyan diçûn, 'esra em diçûn heta me'rebê em digihan Sêblal. Emê li wê de mênin, heta sibihî reqisin û sibehî dirabûn û em dihatin malê. Ma govendek û yek û sê bûn, dinya diçû. Êdî digo qûmaşin derketin digon qûmaşê fitîlî, wilo î spî bû î bi xet bû û êdî wan zilaman, gencan hemûyan gomlekê spî li xwe dikirin. Yê pîrekan şîn û sor û zer û kesk û xemrî û îdî ew desmalên hewrîşmî didan serê xwe, hinekan dikirine sityê xwe hinekan pişta xwe girêdidan, gulîya wan li kaba wan diket û diketne govendê de û direqisîn. Di go zêw e (dikenê) Bi Qur'an ji serê çemkê Şeda heta çûbane binê Devêberûwê (bi qasî 4 km ye) însanbûn. Xelk zahf diçû me jî digo keçê xelk zahf çû de em herin hê nebû dereng." (Hedîye Aksoy)

> "Keça min, me havîna zêw dikir xelk dihatin. Em diçûn, hingî dinya ava bû, me sê pez digûrandin û ev qa (kumla destê xwe nîşan dide) goşt ne digiha me, mêvanê me hebûn nedgiha me. Ji vir nêzîkî berî 'esrê ji vir dibûne rast û em diber rezê xwe de em diçûn zêwê." (Ayşe Dursun)

> "Niha zêw betal bûne lê berê keyfeke zahf dikirin, direqisîn li wir, dawet dikirin. Bavê me û bapîrê me digot bi heta Sûrî û heta kurdên Iraqê jî daxîl dihatine vê derê zêwa wî (Zêwa Sêblal) û mesele vî gundî (Bêcirman) ji wa re xwarin çêdikirin ew qa miletê ku dihatin misafirê vî gundî bûn. Kesekî tiştek netanî û li vê derê li vî gundî ew mêhvan tev xwarina wa û xizmeta wa heta yanî ew zêw xilas dibû dikirin. Berê mesela ereba nebûn weke îro, inkanên milet nebûn, milet bi heywanan dihat. Hê berîya zêwê bi rojekî diduya milet dihat cihê xwe ewk dikir. Berê mitirp tanîn, eme piçûkbûn li wê derê govend heta sibeha jî milet zêw ji bo keyfê dikirin. Ma'na zêwa wî keyf bû. Hetta sibeha direqisîn milet li wir. (Bavê xwe nîşan dide) Ew li zêwa Sêblal zahf reqisî ye."[3]

Gundîyan organîzasyona roja zêwê di navbera xwe de dikirin û karên ku wê bê kirin li hev parve dikirin. Gişan alîkariya hev dikirin û karê çêkirina xwarin û xizmetê di nav hev de parve dikirin. Hinekan xwarin çêdikir, hinekan dida, hinekan paqijiya piştî xwarinê dikir û giran bi hev rê wê êvara zêwê bi qasî qeweta xwe mêvan dibirin mala xwe. Bi vî awayî zêwa

[3] Vebêjer Tewfîq Aslan (46) ji gundê Bêcirmanê ye. Dengê wî bi rêya telefonê di 26ê Adara sala 2023yan de hat tomarkirin.

xwe bi serbilindî diqedandin. Zêw, li hin deveran sê rojan li hin deveran jî du roj bûn lê bi gelemperî du roj û şevek bûn.

Zêwên herêmê bêhtir bi navê wî/ê kesayetî/a pîroz dihatin binavkirin. Di roja me de zêwên gelek gundan hatine jibîrkirin û em dibînin ku çanda zêwê her ku diçe qels dibe. Tişta balkêş ew e ku her çiqasî însan neçin qada zêwan jî teqez her sal qurbanên xwe serjê dikin. Ev jî nîşaneya qeweta rîtûlela zêwan an li ser însanan e. Li gor rêza dîroka lidarxistina wan, 7 zêwên ku li herêma Kerboranê tên pîrozkirin, ev in:

- **15ê Tebaxê (hefteya yekem):**

Zêwa Şêx Momina (Xelîla)

Zêwa Şêx Şivan (Basqil)

Zêwa Şêx Şa'ban (Deywan)

- **22yê Tebaxê (hefteya duyem):**

Zêwa Şêx Hesen (Batêrgiz)

Zêwa Şêx Mehmûr (Kerben)

Zêwa Bagûlîyo (Şibêbîyê)

- **29-30yê Tebaxê (hefteya Sêyem û ya dawî):**

Zêwa Sêblal (Bêcirman)

BEŞA SÊYEM

ÇANDA ZÊWÊ Û EFSANEYÊN KU LI HERÊMA

KERBORANÊ TÊN VEGOTIN

3.1. Şêx Momina

Derbarê cih û warê Şêx Momina de tu agahîyên fermî tune ne, lê li gorî riwayetekê Şêx Momina ji gundê Dînûwayê ye. Ev gund di navbera gundê Hespist (Yarbaşı Köyü, İdil) û Gundê Bafê (Sulak Köyü, İdil) de ye. Aniha xerabûyî ye. Bapîrê wê koçî Gundê Xelîlayê dike û li wir dest bi jiyaneke nû dikin. Piştre diya wê dimire û jinbava wê tê. Jinbava wê gelekî xirabîyan lê dike û her gav gazinan ji bavê wê re dike. Dibêje keça te her şev bi xwe de dimîze û ez wê bi vî şiklî qebûl nakim. Bavê Şêx Momina naxwaze tiştekî ji keça xwe re bibêje û wê xemgîn bike. Biryar dide wê her şev rake ji bo tûwaletê. Şêva ku ew ê keça xwe rake dibîne ku keça wî dibe kevokek û ji qulika derî difire diçe ber bîrekê û pezê kovî av dide. Piştî ku bavê wê ev rewş dît baweriya wî bi keça wî tê û wê diparêze ji jina xwe. Wextekî zêde derbas nabe Şêx Momina di şikefta ku tê de dimîne dersa Qur'anê dide însanan û nav û dengê wê li dinyayê belav dibe. Gelek sir û kerametên wê xuya bûne û ev sir wek efsaneyan hatine vegotin. Derheqê zayîn û mirina wê de jî tu agahî tune ne. Ew tu caran nezewicîye û berê xwe daye ber hezkirina Xwedê. Gora wê li binya Gundê Xelîlayê ye. Şikefta ku wê ders dida hatiye parastin. Me nedît, lê li gorî beyanên gundîyan bîra ku pezê kovî jî av dida hîn jî li wir e.

3.1.1. Zêwa Şêx Momina

Zêwa Şêx Momina li gorî hesabê kurmancî her sal 15ê tebaxê li gorî roja înê tê lidarxistin. Berê bi hezaran însan ji Kerboranê û gundên derdora Kerboranê dihatin zêwa wê. Zêwa wê li ser gora wê dihat lidarxistin. Xwarin dihatin xwarin, qurban dihatin serjêkirin, mitirban li kemançê dixistin û keç û xortan, ciwan û pîran bi hev re govend digirtin. Stran digotin û li hev vedigerandin. Zêwa wê du roj û şêvekî bû. Roja pêncşemê dest pê dikir roja înê ber êvarkî diqedîya.Dilşa Gul û Mehmet Alî Ercan bi vî awayî behsa zêwê dikin:

> "Wextê em zaro û em piçûk bûn, miletê va gundê dora me, çewra me hemû dihatin vê derê, zêwa xwe li vê derê dikirin, li Xelîla dikirin. Di go Zêwa Şêx Momina nîvê heyva tebaxê 15ê wê çê dikirin. Gundê me hemû Tîrûwa, Werzikê wer hasil em bêjin dora Îwan gunda hemû qesta zêwa Xelîla dikirin, dihatin zêwa Şêx Momina û li rexê wîyalî digotin Bena Qubikê, li wê derê go dawet girê didan û xwarin çêdikirin ji mêhvana ra, her malekê gora ku digotin, her malekê dora deh mêvanên wan çêdibûn, ya hinan hindiktir, ya hinan bêhtir mêhvanên wan wiqas çêdibûn, hingî ji

deveran miletê xerîb tan û zêwa xwe dikirin yanî hetta êvarî bi dawet û keyf û şahî derbas dikirin. Lê min bi xwe ew nedîtiye, ne di zemanê min de bû, hê em zaro bin me bi xwe tiştê wulo yaşamiş nekir. Ji wir pê de jî wexta ew(dawet) betal bû û kes êdî nedihat pê da sûreklî wextê dibû heyva tebaxê, 15ê tebaxê rehme lê diya min û bavê min li malê be heme Xwedê çi qismet kir, heke heywanek serjê dikirin, heke be çi heywan, heke pez, heke mirîşk, heke be Xwedê Te'ala çi hez kir serjê dikirin û wê xwarineka baş jî çêkin û li nava gund dagitmiş kin (belavbikin). Zêwa wê exleba roja înê çê dikirin." (Dilşa Gul)

"Bapîrê me o kalikê me o ejdadê me, 15ê heyva Tebaxê, digo zêwa wê ya. Û melayê me baz dida wê rojê. Melê go, heyra win gunehkar in zêw, kemaça o rexs o dawet ji weliyan re nayê gotin. Ezê sond xwûm zêdeyî şest, heftêyî gundî dihate Xelîla zêwa wê. Wê şevê xew nebû. Yanî di heyv diman me kara wê dikir." (Mehmet Ali Ercan)

3.1.2. Kerametên Şêx Momina

Bi taybetî kesên ku zarokên wan çênabin xwe davêjin ber hikmet û rehma wê û di nav hicrika wê de deydikeke ku di şikilê deydikên zarokan de ne çêdikin. Serê tayê xwe bi dîwarên hicrika wê ve girê didin û kevirekî dixin nava wê deydike, heger deydik kil bibe dê zarokên wan çêbibin lê heger deydik kil nebê zarokên wan çênabin. Li gor beyanên gelek kesan bi vî şikilî zarokên gelek kesan çêbûne. Weke din ji bo gelek daxwaz û hêviyên cur bi cur insan hawara xwe digihînin Şêx Momina û daxwazên wan bi cih tên. Li gorî beyanan gelek kesên herêmê gelek caran însanên ku xwe diavêjin ber hikmeta wê û daxwaza xwe bi rêya wê digihînin Xwedê û Şêx Momina tê xewna wan û bersiva daxwaza wan dide.

3.1.3. Mezela li Kêleka Tirba Şêx Momina

Li kêleka ziyareta Şêx Momina mezela yekî heye ku navê wî Seydayê Mela Evdilhekîm e. Şêlikî ye. Li gorî ku kesên herêmê dibêjin ew alimekî gelekî xurt e û wextê ku ketiye ber mirinê wesiyet kiriye û gotiye, bi tenê sebra min nayê, min li kêleka Şêx Mominayê weşêrin. Li ser wesîyeta wî piştî ku wî wefat kiriye ew li kêleka Şêx Mominayê veşartine.

3.1.4. Efsaneyên Derbarê Şêx Mominayê de Tên Vegotin

3.1.4.1. Efsaneya Derheqê Welîbûna Şêx Mominayê de

"Şêx Momina bi eslê xwe ez nizanim ji ku ye, ema li Xelîla de yaşemiş bûye bi keçkaniya xwe va hicrika wê li vê da xwarê, li bin me re ye. Piçûçik bû qey ciya wê wefat kiriye, bavê wê jineke xwe dî aniye û hicrik ewilî wek şikeftek bû tê de yaşemiş dibûn. Peyre wextê bavê wê yeke xwe anî û şiveqa ku ji xew dirabû cilê wê hemû şil in û jinbava wê pê de dixeyidî. Di go yanî bi xwe de dimîzê, lêdida û talî gote bavê wê; qîma min jite re nayê, çima halo keça te nivîna şil dike, xwede dimîzê felan, xeyidî. Go rabû rojekî bavê wê go; heyra ev

ne rojik û do ne, ezê îro nobetê lê girim, ezê wê rakime destilmêjê, deqena xwe şil neke. Go nobe lê girt wilo nav cihê xwe de lê dihsêne, lê yanî dîqqata wê dike ema nizanê ku deqana qîqaya wê çekmişneke ku yanî î şîyar e, li nav cihê xwe de wilo hişyar û dihesênê. Go neqlekî danekî şevê û keçik ji nav cihê xwe rabû û weke teyrikî çêbû û me digo kilîlê deriya, ew deriyê darî ku zemanekî bi tilîyê xwe vedikirin an bi enaxtarê darî me vedikirin, go xwe di wê kilîdê ve kir û derket çû. Rabû hêdîka bavê wê jî, li pey derket. Qunaxa ku mihov dibe ezê ji vir çim (cihê ku ew wê kêlîkê li wir nîşan dide) bê bi linga ezê çim pêncih deqa heye bi xerantî, ancix miro bigihê wê de rê. Çalek wilo dûr e, ara Xelîla û Basqil de ye, tam di hidûd de ye. Li wê derê go, diçû devê wê çalê, nîvê şêvê beriya melayê sibehê wa. Go bavê wê dûrû dûrî taxîba wê dike û diçê wê derê. Ku mêzand diçê devê wê çalê û bakire pêz go: ehê, ehê, ehê (deng derdixê) û bakire pêz û werhasil go neqlekî pezê kuvî hat ser avê. Got, hemû hatine ser wê avê, hetta nêzîkê melayê sibehê, ew pez av daya û ji we pê de jî çilo pez xilas bû, çarekê din çû. Îdî bavê wê fêm kir ku keça wî welî ye, gerî vegereha malê û dey wê nekir û heya îdî peyde ew hat xwe kire nav ciha de. Me'lûme êdî cilê wê li devê çalê dîsî şil bûn. Go, sibehê jinbava wê rabû dîsî go wella qîma min naye, çimaneke keça te xwe şil dike. Bavê wê got: heyra qerişmîşî keça min nebe, çinkû bavê wê fem kir, ji dest dît. Go: Qarişmişî keça min nebe, te ne çi ye de, go, xwe şil bike, şil neke îşê te jê nîne. Jinikê got qîma nin jê nayê filan û bêvan. Rabû terka jina xwe ser keça xwe da. Go, heyra ti kêrî min naye, go an ti qarişmişî keça min nabe, yan ti kêrî min naye. Rabû jinikê qot: heyra qîma min nayê, ma ne rojek û do ne, werhasil min azad ke. Jinik çû û mane ew keçka xwe tenê." (Dilşa Gul)

3.1.4.2. Efsaneya li ser Sofiyên Baxdayê û Bûka Şimayê

"Peyre îdî weke ku dibê, bavê wê tam fêm kir ku welî û bavê wê îdî îşê xwe jê neanî. Peyre go di wê hicrikê (şikeft) de dersa Kur'anê da feqeha. Go, rabû îdî navê wê bi dinyayê ket. Go wella welîyek li Xelîla çêbûye, navê wê kirine Şêx Momin. Werhasil go ji Bexdayê bihîstini go wella welîke li wir e. Go rabûn gotin:

"Emê çinê ji Baxdayê

Emê çine darî sirê Mominayê

Kesî nedîye ku sofî rabûne ji Xelîla ye…" (Ayşe Dûrsûn)

Bapîrên me bi xwe jî dibêjin Sofî Hecî (Sînkî ye), yanî bavê kalikê me ye, ew jî micewirê Şêx Momina ye. Ji Bexdayê welî tên darî sirê wê. Li wê derî bûka çêdikin ji şimayê, dikine paşilê xwe de. Dibên heke welî be wê sirê me derxê, heke ne welî be xwa boş e, çûmkû welî ji pîrekan çê nabin. Têne, li vê derê em dibêjin Tûkê Belek, vê niwala xwarê. Şêx Momin

dibêjê bavê me yî Sofî Hecî, dibê Hecî herin wêêêheye! Sofî hatin ji Bexdayê, herin pêşiya wa, mêhvanê min in. Dirabin tên wextê nêzîkî wê dibin. Dibê (Şêx Mominayê) ka werin hûn bi xêr hatin, win ser çava hatin. Dibê:

"Welî hatin ji Bexdayê

Bûk çê kirin ji şimayê

Hatine darî sirê Mominayê." (Vegêran hestiyar dibe digirî.)

Go, wextê ku wilo gotin, hemûka nûka go, Seddeq! Tu welîyî wellah. Înanmiş kirin." (Dilşa Gul)

3.1.4.3. Efsaneya Tirî û Hejîran

"Rabûn çûne hindirû, Xwedê çi qismet kir werhasil ji xwe re şitexilîn. Go, rabû gote bapîrê min Sofî Hecî, go, Sofî here binê delika selik tirh û yek hejîr ji mêhvanê min re bêne û mêwekî jî ji kokê rake tevlû tirh bêne hindirû. Go rabû Sofî got: Ya Şêx Mominaya delal, berfe li 'erdê ye, tirh niha çitke, hejîr çitkin. Go, bapîr ez dibêjime te here! Rabû çû. Go çû û meyiza maşallah ji Xwedê re, halo ti dibêje qey tam wextê tirh û hejîra ye, kîm kîma tirh û hejîra ye. Go selîk tişî hejîr kir, yek tişî tirhê xwe kir û rehkî mêwê jî qûraft yek hişt, go bila ez ji zarokên min re bimenê. Ezê sibehê êm ji zarokên xwe re jêkim. Û werhasil hejîr û mêw ji kokê rakir û anîn hatin kirne nav mêhvanê xwe de. Go êdî (Şêx Momina) tirh kire nav mêhvanan de, go êdî kêrika wa bide wa bila ew ji xwe re tirh jê bikin. Go wextê ku rahiştine kêra ku tirh ji dewla ji mêwê bikin, go mêzand ku wê herkesekî riha xwe qut kirine. Go, wî got te riha min qut kir, go wî go te riha min qut kir. Go heyra sedeq wellahî welîya Xwedê Te'ala ye me tobe ku em hew şikayetê bikin jê. Û gote bapîre ma yî Sofî Hecî, go bapîr tirh û hejîra bixwe. Go, digo na min xwarina. Go, digo ji zarokên xwe re bibe. Go digo wella ez nabim. Go, heyra ji zarokên xwe re bibe, xeyala ku tî tê de betal e boşê çîk neke. Go dîse bapîre me got na. Bapîrê me jî nabêjê û sibehî diçê dimêzêne ku ne tirh ne tişt û ser tişî berf e û rezekî hişk û hola." (Dilşa Gul)

3.1.4.4. Efsaneya Nifir û Duayên Wê ku li Heft Bavikan Kirine

"Peyre jî wextê ku îdî Şêx Momina ji bo mekanê xwe da'wa axê kirî, da'w li heft bavikê xelîliyan teva kiribû lê nedabûn, bûdaxkîyan tenê dabûn. Nifir li hemû bavikan kiribû. Ji bûdaxkîya re gotibû tûxmê we her û her zêde bibe. Gotibû me tûxmê we zêde nebê, gotibû aslankîya keçelî ji we xilas nebe û êdî ez ya hûrikîya, mehmeroşkîya, şêrikiya nizanim." (Dilşa Gul)

Li gorî ku vegêraneke din dibêje:

“Şêx Momina got cihekî bidine min ko ez mirim, bila xelq min bike ziyaret. Yanî êminiya kesî lê nayê, dibê: Keçike sêwî ye. Ne dê ye ne bav e, wê cilo bê ziyaret! Diçê nav Xelîliyan li nav ezbetan digerehê, Xelîlî jî pê şeş ezbet in. Kes cî nadiyê de. Ev cih yê bûdaxkîya ye, baveke. Go, vî cihî bidne min, nedanê de. Bêdiayî li wa kir go: Xwedê bike hûn res bibin, wextê hûn çêbin hûne res bin. Go, bûdaxkî reş bûne. Go sinkî jî, digo bavê Sofî Hacî, ew jî sinkî ye. Go heyra cihekî bidnê de, nedanê de, go xwedê bike wine kêm bin. Gote şêrilkî ya, şêrilkî ya jî nedayê, go Xwûdê bike wine zilm bin, wa jî nedayê. Gote aslankiya, go heyra cihekî bidne min, wa jî nedayê, go Xwûdê bike wine keçel bin. Çû nav hûrikîyan, go hûrikiyan jî nedayê. Go Xwûdê bike wine hûr bin. Weke wê çê bûye, her bavikkî ew nav li wa ya û a wilo ne. Rabû ser xwe li vê derê bûdaxkîya demek sirê wê dîtin, ev der ya bûdaxkiya ye danê de. Ev der kirne mişayîx.” (Ayşe Savci)

3.2. Şêx Mehmûr

Derheqê nasnameya Şêx Mehmûr de tu agahiyen birêkûpêk tune ne. Li gor ku kesên herêmê beyan dikin ew welîyekî Xwedê ye û bi zanîn û sekna xwe bûye rêberê gundiyan. Navê wî ji bo ‘ilm û zanîna wî li nav hemû herêmê belav bûye û insanan pêşî xwe spartine rehma Xwedê û paşî wî. Baweriya xwe pê anîne û însanan ji bo hêvîya çareseriya her derdî xwe avêtine ocaxa wî. Zarokên xwe ji bo parastina ji qeza û belayan kirine koçekên wî û ev wextekî pir dirêje ku her sal ji bo bîranîn û qurbandayîna ji bo koçekên xwe an jî daxwazên xwe ku an bi cî bûne an jî nû dê bên xwastin zêwa li dar dixin û rêzgirtina xwe nîşanî Şêx Mehmûr didin.Berê secereya wî hebû ku ji aliyê şeş heft siltanan ve hatibû mohrkirin, lê di wextekî nêz de wenda bûye. Lê bi qasî ku gundî beyan dikin Şêx Mehmûr ji Hicazê hatiye û hatiye “Leterê” ku ew der bi Mûşê ve girêdayî ye û dawîyê jî hatiye Gundê Kerbenê (Suçatı) ku bi navçeya Kerboranê ve girêdayî ye. Piştî ku li Gundê Kerbenê dimîne li wir dizewicê û sê kurên wî yên bi navê Haşem, Mistefa û Şêx Alî û keçikekê wî bi navê Sosin heye. Piştî ku dimirê hicrika wî li mekanê wî çêdikin û wê derê dikin ziyareteke mezin. Piştî ku keç û kurên wî jî dimirin wan li cem bavê wan di hicrika wî de vedişêrin. Ji ber ku ew welî û qencekî Xwedê bû û alimekî têr û tije bû li herêmê gelekî binavûdeng bû û her kesî hawara xwe pêşî digihand Xwedê paşê jî Şêx Mehmûr. Her sal li gor hesabê kurmacî (teqwîma hicrî) di heftiya sêyem a meha tebaxê de zêwa wî dihat lidarxistin û bi hezaran însan diçûne Gundê Kerbenê ji bo zêwa wî pîroz bikin. Derheqê wî de gelek efsane hatine vegotin ku hîn jî di nav gel de gelekî berbelavin û li herêmê em rastî van efsaneyan dibin. Yek ji wan efsaneyan jî derheqê hatina wî ya gund de ye.

3.2.1. Zêwa Şêx Mehmûr

Zêwa Şêx Mehmûr li gorî hesabê kurmancî di hefteya sêyêm a tebaxê de ye. Bi texmînî dikeve 21, 22, an jî 23yê tebaxê. Zêw, li gorî hesabê roja înê tê pîrozkirin. Xalê Evdilezîz bi vî şikilî behsa zêwa Şêx Mehmûr dike:

> "… belkî dihezar insan dihatine vê dê. Gundiya wan li serê malê sewalek digûrand û bawerke Xwêde wekala carna mala me, me sê sifre jî didanîn. Yanî her neqleke ko dihatin wilo bîst, sih, çil zilam jî dihatin. Zêw hebû û mitirp dihatin. Wella dahol nedigotin, lê yanî kemançe ew digotin. Lê digo Şê Mehmûr daholê qebûl nakê. Go qebûl nake wixtê li daholê didan, daholê wa diqetehan. Wekî yanî ez dibem ev neh deh sale halo ev nexweşî ketne dinyayê de betal bû. Naxwe wekî dî daîm zêwa wî hebû, vega jî serê malê sewal digûrênin, kahrekî digûrênin, lê me'lûme weke berê milet nayê. Koçek moçek ew tên lê ew miletê berê nayê. Carê xelqê gomlekî xwe kirî şalekî xwe dikrîn, digo emê çine zêwa. Dihatine vê de diçûne Derêca, diçûne ya Şê Hesen û diçûne ya Sêblal û çûne Xelîla û çûne Hîzar. Ew tişt betal bûne îdî. "(Evdilezîz Seyhan, 73)

3.2.2. Kerametên Şêx Mehmûr

Hem însanên herêmê hem jî yên derdorê ji bo hemû derdên xwe, nexweşîyên xwe û daxwaz û ricayên xwe, ji bo hawara xwe bigihînine Xwedê xwe diavêjine ber perdeya Şêx Mehmûr. Li gor ku gelek kesan beyan kir, her însanê ku xwe avêtiyê ber perdeya wî, ji destên wî ji nexweşî û belayan rizgar bûne û şifaya xwe dîtine û daxwazên wan bi cih bûne. Ji ber vê yekê jî însanên herêmê zarokên xwe dikin koçekên wî û her sal zêwa wî li dar dixin û qurbanan ji bo wî serjê dikin.

3.2.3. Efsaneyên Derbarê Şêx Mehmûr de Tên Vegotin

3.2.3.1. Efsaneya Hatina Wî ya Gund (Efsaneya Kêlikê Şêx Mehmûr)

"Şêx Mehmûr zilamekî qenc e. Dibê zemanekî, dibê ji xwe me ne dîtiye, lê malêk hebû digon mala Şêxoyê Fatê, eslê xwe 'İmarî bûn. Dibê îdî kalikê wa çû hicê li wa da maye. Dibê çûye devê dikana yekî ereb.(Yê ereb) Gotiye ti kî yî? Gotiye: wella ez ehlê Tirkî me û ez ji hacîya ma me ala ezdota me. Gotiye roja înê yek ji wî rexê Tirkî ve tê vê dê xûtbê, li vir be ku axir ku hat ezê şanî te dim. Îdî dibê ku hat, dibê ha ev e. Wî çû axir go ji xûtbê wa derketin, destê xwe avêta cilê wî (cilê Şêx Mehmûr). Dibê ma xêr e, derdê te çi ye? Dibê ezî ji Tirkîyê me û ez ji haciya mame û e nikarim herme mal e. Bê gotiyê here nanekî xwe bêna ji firnê. Û hatiye. Gotiye çavê xwe bigre û gotiye Bismillah, îdî em dibên Kêlikê Şêx Mehmûr heme di neqêba me û 'İmara de ye, hê jî ew kêlikê li wir e. Dibê li wir mêzandiye ku wê li wir e ew û camêr. Îdî hate vir, mal xwe anî bû sofîyê wî." (Evdilezîz Seyhan)

3.2.3.2. Efsaneya Derheqê Zarokên Wî de

“Sê kure wî hene. Haşem e û Mistefa ye û Şêx Alî ye. Em sê bav niha li vê dê hene. Dibê Mistefa kurê mezin bû, meznatî da kur û dibên Şêxanî dabû Şêx Alî û dibê ‘ilm dabû Haşem. Heqqeten vêga ev Haşemkê me hemî wilo ‘alimin, qur’anxwenin. Dibê Sosin jî hebû keça Şêx Mehmûr bû. Ev pismamê me hene, dibê yê Sosinê ne.” (Evdilezîz Seyhan)

3.2.3.3. Efsaneya Çireya Şêx Mehmûr

“Çireya hicrika Şêx Mehmûr hebû. Bi Xwedê min bi çavê xwe jî dîtiye ku çireya wî vêdiket. Wa salê hanêkê, wilo qulike ha halo (her du destên xwe didê ber hev û şiklê qûlikekê çêdike) a di meqbera wî de bû. Daîm çira wî vê diket. Havîna wan vê diket. Xwedê di tirba wî de wilo dengê erbanê jî dihat.” (Evdilezîz Seyhan)

3.2.3.4. Efsaneya Bayê Kurr

“Dibê xebero Şêx Mehmûr destilmêj girtiye, dibê wextê ku destilmêj girt dibê qeşa bi zendikê destê wî ve çê bûye. Dibê di’a kir go: Ya rebbî vî bayê kurr deyne. Gerçek nayê, yanî heqqê Xwûdê, ha vêga jî ku ti hatî vê diryana me û ku diçê Derêca û werê cem me, heta bi wê sinirê me ye. Tê dibê ha ev der e sinirê wan û ji vir ve jî ‘eynî wilo. Ti herê neqêbêna me û Bêrkevan wilo, ha ti ser devê vê lata he (lateke, wek zinarekî ye ku li pêşya gund dimîne nîşan dide) em dibên Îzar, Îzar heme di pişt wir de ye, bibê gum, gum, gum wilo berf, halo sayî ye berf ji wa da û wî rexê me ve tê. Lê ki Kerben ebbeden, halo eme li ber tavikê ne. Berf e li ‘erdê sitane lê ebbeden hiç em ji bayê kurr aciz nabin. Bayê kurr nayê vê hêla.” (Evdilezîz Seyhan)

3.2.3.5. Efsaneya Hejîrê

“Dibê xebero mêhvane wî (Şêx Hesen) hatin, dibê îdî Sofîkekî wî hebû, ew hejîr jî di nav mişayîx de bû lê niha qelaya, îdî gota sofî go hera hejîrna werêne. Dibê sofî çû (vebêjer dikene) a’lebe sitane, çêleye, go hejîra ha wilo reş dike. Dibê axir hinek kirne selika xwe de anîn ji mêhvên re. Go, sofî were bixwe, sofî neçû, ji xwe re hinek hiştibûn. Dibê hinek ji xwe re hiştin. Dibê îdî rabûn go sofî ew xewna te betal e. Çû sofî çû go dareke hişk û hola. Yanî hejîr jî wilo bû. Ew hejîr min dîbû Xwedê Wekala Ellah Şahîd lê wa qelaha ye.” (Evdilezîz Seyhan)

3.2.3.6. Efsaneya Aşêva Birincê (Avîya Şêx Mehmûr)

“Dibên qencna Xwedê hatin heft in, hatine tecceriba wî. Îdî avîke wî hebû, digotin avîya Şêx Mehmûr,hê jî ew avî dimîne. îdî kirbû birinc, hatne cem go ma çima ti bi destê xwe

aşêvê dike? Di nav avê de wilo ew giya miya dida hev. Dibê, wella ma ez ji ku zanim, min go belkî bi desta çêtir bê. Gotne, wa hevalê wî wan, go heme bêje: "Aşêvê ji nav derkeve." go Şêx Mehmûr gote wa, heme win bêjin. Dibê îdî wan di du car sê caran de ji navê derxist. Dibê îdî Şêx Mehmûr di heft caran go herin nav ard de û ji nav derkeve û sîse dihate nav. Yanî Şêx Mehmûr wî qasî lez çêdikir. Lê me'lûme mihov bi destê xwe bişûxilê baştir e." (Evdilezîz Seyhan)

Li gor varyanteke din a vê efsaneyê Şêx Hesen diçe cem wî. Ew heta sê caran diçin û tên di nav aşêvê de, Şêx Mehmûr heft caran diçe û tê. Di vê varyantê de berawirdkirinek heye di navbera Şêx Mehmûr û Şêx Hesen de. Di encama vê berawirdkirinê de sirrên Şêx Mehmûr ji yên Şêx Hesen bêhtir in.

3.2.3.7. Efsaneya Aşêfa Birincê ya Şêx Mehmûr-2

"Go Şêx Mehmûr holo weke me însan bû. Go îdî qey Xwûdê dabûyê de. Go rabû Şê Mehmûr li Nêwertê aşêfa birinc dikir û go Şê Hesen, te dî zêwa wî jî heye dibên zêwa Şê Hesen, û ew jî hata, heke hate gorişma wî, hat go ê aşêfê dike. Go: Kuro ti aşêfê bi destê xwe dike? Go: A. Go: Naxwe ti ji çi re şêx î? Rabû gote Şêx Hesen, go: ka êdî bêje Bisimllah Rehmane Rehîm aşêvê ji nav derkeve. Go (Şêx Hesen) sê caran got ji nav derket, ya çara hew derket. Go wî heft cara gote aşêfê go ji nav derkeve û bikeve nav de, ji nav derkeve. Go mêzê îdî sirrê wî ji yê wî bêhtir bûn. " (Makbûlê Şakar)

3.2.3.8. Efsaneya Rima Şêx Mehmûr

"Carê heyama berê qitlixe zahf bû, baran nedihat, toximê ku davêtine 'erdê şîn nedida. Ji boyî wilo insan zahf mehçûb diman û insan diçûne liqatê, diçûne îş, diçûne dora Sûrî, 'Iraqê wa diçûn paleyîya wa dikirin heta di(du) 'elb dexil didane wa. Diçûne siqatê ji xwe re yanî. Îdî Rebbe min wilo hîkmetek da va insanê vî gundî, wextê ku baran nedihat û insan dimane sekinî, dexla wa dima li 'erdê şîn nedida,'ekkaseyekî (rim) Şêx Mehmûr hebû. Dikirina nava birkeke ku wilo peşkek av jî tê de hebane dikirnê de. Rebbe 'alemê wilo dikir go bûlût(ewr) digehane hevdu, baran dihat hettah ta nederandibane baran nedisekinî. Digotin 'ekkase weke ku tu bêje weke mizraqeqî bû, bê serê wî tûj bû î dirêj bû weke di metra bû, yaziya erebî qur'anê li serê bû. Wextê ku va insanan ji birkê di derand baran hew dihat, ew bûlût daxilmişdibûn (belavdibûn) baran hew dihat. Va gundê dora wî gundî jî dihatin digotin; ji boyî Xwedê bidne me jî rojekî, em bibin bi izna we. Go birin, henek kotîniyetî (neytxerab) derketin û ew 'ekkase winda bû." (Hîcret Akkaya)

3.2.3.9. Efsaneya Tasika Şêx Mehmûr

“Dibê pîrek carê tixtor û ew nebûn û doxima pîrekê guneydoxû ji pêşî de zahf bû, heta pazdih zarokan jî gelek insana bi zaroka doxim kiriye. Wextê ku doxûma wan li wa zehmet digeriya, sanciya beşlamiş dikir (destpê dikir) yê go doxim bikin,yanî zanîbûn. Tasikek hebû, tasikeke Şêx Mehmûr hebû, yaziya Erebî ya Qur’anê li serê bû, di nava wê de jî guha hicê hebû. A tişî av dikirin, gula hica xwe dikirine nav de, weke darikekî hişk û hola bû, wextê ku bi izna Rebbê min av digehatîyê de, devê weke ku ti dibê destin di’a dikin divebû. Wextê ko divebû ew hermet doxim dikir. Kerameteka holo di tasika Şêx Mehmûr de jî hebû lê tasika Şêx Mehmûr jî a nihakê winda ye, aqibeta wê jî ne bellî ye.” (Hîcret Akkaya, 36)

3.2.3.10. Efsaneyên Dara Şêx Mehmûr

“Ev dar (vebêjer darê nîşan dide) dara Şêx mehmûr e. Keraneta wê jî ew e, şîrê ku nemeyê darikî ji wê nakê dikine nav şîrê xwe yê germkirî de, bi emrê Xwedê Te’ala ew şîr dibê mast.”

“Ji boyî zaroka ku şîrê wê î xirabûyî be, yanî diya wê nikaribe bebaka xwe şîr bidê, piçikî ji benîştê wê hem ji şêkir re hem bi bedena xwe ve, bi singa xwe ve bikê, ew zarok ji şîr divebê, ew zarok hew şîr dixwazê.”

“Di çiqil ji vê darê hişk bûne, wextê ko çiqilê wê hişk bûne, nîvê gund bar kirîye, nîvî maye. Di alîya bûye. Insanekî gotiye darê wê hişk e, darekî wê birîyê gotiye, dikevê rê de. Melakekî wextê ji vê derê birîye û çûye qeza kiriye, ew û birayê xwe herdûka rehmet kiriya.

“Axa vî mişayîxî jî ji bo însanên ko zarokên wan çênebê derman e. Gelek insan tên, ji dewleta insan xwe davêjine ber perda Şêx Mehmûr, bi izna Xwedê Te’ala, Xwedê Te’ala ewladên salih didê wa.” (Hîcret Akkaya)

Dara Şêx Mehmûr dara kizwanê ye. Li gor texmînan ew 473 salî ye. Ev dar ketiye bin parastina Wezareta Hawirdor û Bajarvanîyê ya dewletê.

ENCAM

Di vê xebatê de em li ser çanda zêwan û têkilîya di navbera zêw û efsaneyan de heya ji destê me hat sekinîn û me ew analîz û rave kirin. Ji ber ku çanda zêwan li herêma Torê çandeke pir berbelav e û analîzkirina wan hemû rîtûelên zêwan û pêwendîya wan a bi efsaneyan re bi serê xwe mijara xebateke din e, em tenê li ser du zêwan sekinîn (Zêwa Şêx Momina û Zewa Şêx Mehmûr) ku hîn jî li herêma Kerboranê tên pîrozkirin. Em çûn wan gundên ku turbeya wan lê ye û di heman demê de merasîma zêwê jî lê tê pîrozkirin. Me bi gundîyan re hevpeyvîn pêk anîn û hem derbarê şêweya pîrozkirina zêwê hem jî efsaneyên ku derbarê Şêx Momina û Şêx Mehmûr de tên vegotin berhev kirin û dawîyê jî me ew dane heya ji destê me hat deşîfre kirin.

Piştî hevpeyvîn û lêkolînên ku me kirin, em gihan van encaman:

1. Zêw, ew merasîm û rîtûel in ku her sal ji bo bîranîna kesayetên ku di nava gel de wekî welî, şêx, qencê Xwedê, mişayîx, seyîd û hwd. tên nasîn û xwedî sir û keramet in, tên lidarxistin. Bi van merasîman bawerîya însanan a dînî xurt dibû û bi xêra van çalakiyan pêşeng û alimên dînê îslamê nas dikirin.
2. Heta salên 90î jî zêw wek festîvalan dihatin pîrozkirin. Bi muzîk û govendê însanan hem wextekî xweş derbas dikir hem jî ji bo kesa/ê ku zêwa wê/î ye qurbanên xwe serjê dikirin. Di roja me de êdî di zêwan de muzîk û govend tune ye û beşdarbûn jî ne wek berê ye. Kesên ku derfeta wan tune ye û nikarin biçin zêwê di roja zêwê de dîsa miheqeq qurbanekî serjê dikin û rêzgirtina xwe nîşan didin. Kesên ku derfeta wan hebe jî diçin cihê zêwê û li mekanê wî kesayetê pîroz qurbanên xwe serjê dikin û diayên xwe dikin.
3. Merasîmên zêwê ji bo têkilî û parvekirina hevpar a civakî gelekî giring in. Ji ber ku carinan bi hezaran însan li hev kom dibûn û hevdû nas dikirin. Bi hev re xwarin dixwarin û ji sibehê heta êvarî keyf û şahî dikirin. Bi van rîtûelan hem ruhê wan hem jî îmana wan xurt dibû.
4. Zêw, her çiqasî bi amanca dînî dihatin çêkirin jî di encama zêwan de bîreke kolektîf ya folklorîk peyde bûye. Zêw, bi gelemperî du roj û şêvekî didomîyan, di vê demê de însanan gelek çîrok û efsane ji hev re vedigotin û ev yek jî bûye sedema derketina kevneşopîyeke edebîyata devkî.
5. Di navbera zêw û efsaneyan de pêwendiyeke gelekî xurt heye. Em dikarin bibêjin ku efsaneyên derbarê wan kesên pîroz û rêzdar de hatine vegotin bûne sedema derketina zêwan. Piştî ku zêw berbelav bûne efsane jî zêde bûne û bûne xwedî hêzeke mezin li ser tevger û bawerîyên gel. Her ku efsane hatine vegotin însanan ji bo her derd û daxwazên

xwe, xwe parastine wan kesan û turbeyên wan wek stargehekê dîtine û bi bawerîyeke xurttir ev merasîm li dar xistine.

6. Di vê xebatê de em li ser Zêwa Şêx Momina û Zêwa Şêx Mehmûr hûr bûn. Ji bo wan gelek efsane tên vegotin û însanên herêmê rêzeke mezin ji bo wan digirin.

7. Di dînê îslamê de em zû bi zû rastî şêxeke jin nayên, bi rastî jî pir kêm in. Em dizanin ku di nava terîqeta mewlewîyan de şêxên jin hene lê weke din em rastî tu jinên ku gihaştine merheleya şêxbûne nabin. Ji ber vê rewşê jî Şêx Momina xwedî cihekî gelekî cuda û pîroz e. Efsaneyên ku derbarê wê de hatine vegotin bûne sedema navdarbûna wê û navê wê li hemû herêmê belav bûye. Di dawîya lêkolîna ku me li ser Şêx Momina kir em gihan vê encamê; efsaneyên ku derbarê wê de hatine vegotin di nava demê de forma xwe guhertine û vegerîyane ser çîrokê. Jiyana wê bi gelek efsaneyên ku li du hev tên vegotin wek çîrokekî tê gotin. Her çiqasî efsane veguherîbin forma çîrokê jî motîfên di nava xwe de parastine.

8. Derbarê Şêx Mehmûr de jî gelek efsane tên vegotin û ev efsane jî wekî mînaka Şêx Momina di helwesta vegêraneke ber bi çîrokê de ne, lê hîn jî wext ji wan re divê. Ji efsaneyên ku derbarê wî de tên vegotin em dibînin ku ew şêxekî li herêmê pir binavûdeng bû û têkilîya wî bi wan şêxên mezin yên wek Sêblal û Şêx Hesen re hebû. Têkilîyên wî gelekî xurt bûn bi derdora wî re.

9. Di navbera efsaneyên ku derbarê Şêx Momina û Şêx Mehmûr de tên vegotin de gelek motîfên hevpar hene wekî mînak: Motîfa anîna hejîr û tirî di zivistanê de, motîfa xweîspatkirinê li hember şêxên din, motîfa firînê, motîfa nifir û diayan, motîfa dayîna xebera şîfabexşîyê di xewnê de û hwd.

Dema em van xisûsîyetan didine ber çavan em dibînin ku di navbera merasîmên zêwan û çanda devkî ya gelêrî de têkilîyeke pir xurt heye û her du bûne sedema geşedana hev.

ÇAVKANÎ

BASCOM, R. W. (2003). Folklorun Biçimleri: Nesir Anlatılar. G. Ö. EKER, M. EKİNCİ, M. Ö. OĞUZ, N. ÖZDEMİR, & Y. ÖZAY (Dü.) içinde, *Halkbiliminde Kuramlar ve Yalaşımlar* (R. N. AKTAŞ, B. AKTEPE, B. DEĞER, A. DOĞAN, Y. ÖZAY, & K. SERDAROĞLU, Wer., R. 468-516). Ankara: Milli Folklor.

BÜLBÜL, M. (2020). Osmanli İmparatorlugunda Tekke ve Zavîyeler: Diyarbakır Hasan Paşa (Balıklı)Tekkesi Örneği. *Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi* . ÇORUM: Hitit Üniversitesi.

ÇELİK, İ. (2005). Bir Eğitim Kurumu Olarak Tekke ve Zaviyeler. *Yayınlanmamis Yüksek Lisans Tezi* . ERZURUM.

ÇİFÇİ, T. (2021). Hewldaneke Tasnîfa Efsaneyên Kurdan Li Gorî Rêbaza Juha Pentîkainen: Mînaka Herêma Semsûrê. *International Journal of Kurdish Studies, 7(2),* , 206-227.

DEGH, L. (2010). Günümüz Bağlamında Efsane Üzerine Teorik Bir Düşünme ve Efsanelerin Tanımı. M. Ö. OĞUZ, & S. GÜRÇAYIR içinde, *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar* (S. Gürçayır, Wer., R. 204-210). Ankara: Geleneksel Yayıncılık.

KARA, M. (1990). *Din, Hayat, Sanat Açısından Tekkeler ve Zaviyeler.* İstanbul: Dergah Yayınları.

KESKİN, N. (2019). *Folklor û Edebiyata Gelêrî.* Stembol: Avesta.

PETİKAINEN, J. (2003). Efsanenin Yapısı ve Fonksiyonu. G. Ö. EKER, M. EKİNCİ, M. Ö. OĞUZ, & N. ÖZDEMİR içinde, *Halkbilimlerinde Kuramlar ve Yaklaşımlar* (İ. GÖRKEM, Wer., R. 223-240). Ankara: Milli Folklor.

SAKAOĞLU, D. D. (1980). *Anadolu - Türk Efsanelerinde Taş Kesilme Motifi ve Bu Efsanelerin Tip Kataloğu.* Ankara: Ankara Üniversitesi Basımevi.

SAVCI, Î. (2012). *Çand û Avahîsaziya Kerboranê.* İstanbul: İmleç Kitap.

TAN, A. (2013). *Turabidin'den Berriyê'ye Aşiretler, Dinler, Diller, Kültürler.* İstanbul: Nûbihar.

Çavkanîyên Malperên Înternete

İslam Ansiklopedisi. https://islamansiklopedisi.org.tr/zaviye 06.17.2023

Kılavuz Köyü. https://kilavuz-koyu.webnode.com.tr/hakk%C4%B1m%C4%B1zda/ 19.06.2023

Mardin İl Kültür ve Turizm Müdürlüğü. https://mardin.ktb.gov.tr/TR-56490/dargecit-ilcesi.html 05.01.2023

Nisaniyan Sözlük. https://www.nisanyansozluk.com/kelime/efsane(2002) 05.02.2023

Türkçe ne demek. https://turkcenedemek.com/kelime/zaviye/ 05.05.2023

Tc. Mardin Valiliği. http://www.mardin.gov.tr/dargecit 05.01.2023

Vîkîpedî:https://tr.wikipedia.org/wiki/Darge%C3%A7it 05.01.2023

Hevpeyvîn

1.

Nav Paşnav: Hîcret AKKAYA

Temen: 36

Perwerde: Nexwedî

Navnîşan: Gundê Kerben/ Kerboran/ Mêrdîn

Diroka Hevpeyvînê: 28.03.2023

2.

Nav Paşnav: Makbûlê ŞAKAR

Temen: 71

Perwerde: Nexwedî

Navnîşan: Taxa tepebaşiyê, Kolana Fenerê, No, 19 Kerboran/ MÊRDÎN

Diroka Hevpeyvînê: 26.03.2023

3.

Nav Paşnav: Evdilezîz SEYHAN

Temen: 73

Perwerde: Nexwendî

Navnîşan: Gundê Kerben / Kerboran / MÊRDÎN

Diroka Hevpeyvînê: 28.03.2023

4.

Nav Paşnav: Dilşa GUL

Temen: 46

Perwerde: Nexwendî

Navnîşan: Gundê Xelîla / Kerboran / MÊRDÎN

Diroka Hevpeyvînê: 28.03.2023

5.

Nav Paşnav: Ayşe DURSUN

Temen: 100

Perwerde: Nexwendî

Navnîşan: Gundê Xelîla / Kerboran / MÊRDÎN

Diroka Hevpeyvînê: 30.03.2023

6.

Nav Paşnav: Tewfîq ASLAN

Temen: 48

Perwerde: Nexwendî

Navnîşan: Gundê Bêcirman / Kercosê / BATMAN

Diroka Hevpeyvînê: 36.03.2023

7.

Nav Paşnav: Hediye AKSOY

Temen: 76

Perwerde: Nexwedî

Navnîşan: Taxa tepebaşiyê, Kolana Fenerê, No, 17 Kerboran/ MÊRDÎN

Diroka Hevpeyvînê: 26.03.2023

8.

Nav Paşnav: H. Şikri SANCAR

Temen: 70

Perwerde: Nexwedî

Navnîşan: Gundê Batêrgiz / Kerboran/ Mêrdîn

Diroka Hevpeyvînê: 26.03.2023

9.

Nav Paşnav: Ayşe SAVCI

Temen: 50

Perwerde: Nexwedî

Navnîşan: Gundê Xelîla / Kerboran/ Mêrdîn

Web Sîte: https://www.youtube.com/watch?v=Tkx-J4QcNYw ji vê sîteyê di dîroka 02.05.2023 hat girtin.

10.

Nav Paşnav: M. Ali ERCAN

Temen: 85

Perwerde: Nexwedî

Navnîşan: Gundê Xelîla / Kerboran/ Mêrdîn

Web Sîte: https://www.youtube.com/watch?v=Tkx-J4QcNYw ji vê sîteyê di dîroka 02.05.2023 hat girtin.